# HÊZa Welatparêz

Sal 2 * Hejmar 5 Adar 1990

Organa Komita Merkezî ya Partiya Heza Welatparêz a Kurdistan


# Nelson Mandela

## Têkoşer, pêşeng, egît û xweşmêrê bizava gelê Afrîka Başûr piştî zîndanîya 28 sala, bi rûmet û serbilindî ji girtîgehê derket...



Nelson Mandela. Ev navê mezin û giran. Hevmanayê têkoşîn, berxwedan û serhildanê, serokê ANC -Kongra netewî ya Afrîka- û hemû gelê azadîxwazê Afrîka Başûr ji sala 1962-ê heta vê salê di zîndanên rejima nijadperest ya Afrîka Başûr da ma... 28 sal. 11-ê Sibatê (1990) saet 15.15-ê ji zîndanê rizgar bû...

Mandela hêj nehatîye girtin şerekî bê westan û jîr dida li hemberî rejima nijadperest. Belê wî di vê maweyê 28 salên zîndanê jî da navbir neda vê xebat û têkoşîna xwe ya paye bilind. Ew dijî dijmin şêr û piling bû. Li pêş gelê xwe pêşmergê canfida bû. Li hember mirovatîya cîhanê jî kotra aşitîyê bû... Di serî da xebat û têkoşîna wî û ya gelê wî ji bo xebat û têkoşînên hemû gelên bindest û pêşengên wan, herweha bo têkoşîna gelê Kurdistan û rêvebirên wê jî nimûneyeke bi qedr û qîmet e...

Nelson Mandela ne hat berdan. Ew di serî da bi têkoşîna xwe û rêxistina xwe ANC û ya gelê xwe û bi hevkarîyeke xurt ya navnetewî ji zîndana nijadperestên rejima Afrîka Başûr ya îro li ser kar, hate rizgar kirin... Ev serkevtine ya Mandela, ya rêxistina wî, ya gelê wî û ya mirovatîya cîhanê ye... Piştî berxwedana zîndanê ya 28 sale ; rûmet, serfirazî û serbilindî bû taca serê Mandela. Lê serşorî û bêrûmetî bû tok û kete stûyê rejima nijadperest! Rejima nijadperest li pêş têkoşîna Mandela, rêxistina wî ANC û gelê wî serê xwe çemand. Mandela di 71 salîya xwe da hêj jî gelek li ser xwe ye. Bi bawerî, enerjî û rika têkoşînê ve têr û tijî ye... Em hêvîdarin ku ew emrekî dirêj bajo û di xebat û têkoşîna gel û welatê xwe da serbilind û serkevtî be...

Li jêr ; kurteparagrafeke silavnama wî ya ku piştî ji zîndanê derket û belav kirî, raberî we dikin...

**Mandela ji zîndanê derket : 11.2.1990**

*" Gelî hevrêyan, dostên min yên Afrîka Başûr. Bi navê azadî, demokrasî û aşitîyê silava li we dikim. Îro li pêş we ne wekî pêxemberekê, wekî têkoşer û pêşmergeyekî sade di hizûra we da me. We bi fedakarî û xebata xwe ya bê westan ez dame berdan. Ji ber vê yekê ez, jîyana xwe ya ji îro pê ve jî helalî we dikim. Spasî bîr û raya giştî ya cîhanê jî dikim ku wan hevkarîyeke xurt nîşanî me da li hember sîyaseta nijadperestîyê... Me di sala 1960-a da li hember êrişên nijadperestîya rejimê ji bo xwe parastinê dest bi şerê çekdarî kir... Ew faktorên ku bûyne sebebê şerê çekdarî îro jî dom dikin... Hêvîya me ewe ku di welatê me da organeke rêvebirîyê dê li ser bingehê wekhevîyê bête danîn... Armanca min ewe ku çi reş çi spî hemû nijad bi wekhevî û biratî di civateke demokratîk da bijîn... Ji îro pê ve jî em'ê bo vê armancê têkoşîna xwe bidomînin..."*

Belê... Mandela piştî 28 sala, bi saxî ji zîndanê derket. Lê gelê wî hêj jî bindest e... Gelê wî berî 28 sala dûrî rizgarîyê bû. Lê belê îro piştî 28 sala nêzîkî serkevtinê ye... Xwezîya me ewe ku Mandela rojên serkevtinê, rizgarîyê û iqtidara gelê xwe jî bibîne...

www.arsivakurd.org

## Partî açıklaması ~ Daxûyanîya Partîyê

### Tevger'in Komedyası...

Tevger adlı gazetenin Ocak 1990 tarihli 7. sayısında "Açıklama" başlığıyla bir "ilancık" yer aldı. Detay - lara meraklı okurların dikkatini çekmiştir muhakkak! İlan'da partimizin adından sözedilmekte ve adımızın değiştiğini "haber etmekte"! Ne gülünç!..
Partimizin, "Kürdistan Halk Partisi" denen "cemaatle" hiçbir ilgisi bulunmuyor ve adını da değiştirmemiştir... Ama Partimiz "Tevger" denen enkazdan bir yıl önce ayrılmış ve bunu kamuoyuna da duyurmuştur.
Politik güç olmanın sınama zemini savaşım alanıdır. Tevger gazetesinin sayfalarına sığınarak, kendisi varolamayan bir Tevger'e yaslanarak "meşruiyet" aramak, zavallılıktır!..
"Toplantı örgütleri"nin ilan ve ağlama duvarına dönen Tevger gazetesinin redaksiyonu da daha ciddi olmalıdır!..

**Kürdistan Yurtsever Güç Partisi**

### Komedîya Tevger'ê...

Di hejmara 7. (Çile 1990) ya rojnama Tevger'ê da daxûyanîyeke bêciddîyet û mesulîyet hatîye belav kirin ku gûya Partîya me navê xwe guhartîye... Eve ne rast e û şerma redaksîyona rojnama Tevger'ê ye!... Berî salekê partîya me ji Tevger'a hilweşîyay derketîye û bi raya giştî ra jî gihandîye...
Çu peywendîya me digel "cemaeta" bi navê "Partîya Gel" jî nîne... Hêzeke sîyasî xwe di qada xebat û têkoşînê da nîşan dide neku di rûpelên rojnameke ji hev ketî da!..
Divê redaksîyona rojnama Tevger'ê jî piçekê ciddî be û rûpelên xwe neke dîwarê rondik û daxûyanîyên pûç yên "Rêxistinên" ku tenê di "kombûnan" da "bejn û bala" xwe nîşan didin!

**Partîya Hêza Welatparêz a Kurdistan**

---

### Newroza We Pîroz Be!..

Newroz wek cejneke netewî bûye şerê rizgarîya gelê Kurdistan... Lewma Newroz (21-ê Adarê) ne tenê wek cejn lê belê herweha dijî rejimên kolonyalîst û dagîrker wekî roja têkoşîn û ber - xwedanê jî tête pîroz kirin. Ji xwe îro ev nave - roke zêdetir li pêş e... Bi vê çendê mena New - rozê bilindtir bûye...
Bi vê bîr û bawerîyê em Newroza gelê xwe pîroz dikin.
Her Newroz bên bi xêr, şahî, têkoşîn û serketin!

### Newroz Bayramınız Kutlu Olsun!..

Savaşkan halkımızın Newroz Bayramı'nı, savaş ve zafer inancı ve andıyla kutluyoruz.

**17 Adar 1988**

**Helepçê ji bîr neke!**

Redaktor : R. HETAV * Navnîşana Peywendîyê : Postlagerkarte 1000 Berlin 65, Nr. 062923 C

# HEVPEYVÎN

**"... Em kurd li hemû esmanê Îran qet ronahîyeke demokrasîyê nabînin di demê vê rejimê da... Bo vê yekê rûniştin, hevdîtin digel vê hûkmetê em xelet dibînin... Gotûbêja digel rejimê karekî xirab e..."**

## Hevpeyvîn

## digel Celîl GADANÎ

**Sekreterê Giştî yê Partî Demokratî**

**Kurdistanî Îran / Rêberîya Şoreşger**

**[PDK-I/RŞ]**



**Celîl GADANİ**

*Celîl GADANI Sekreterê Giştî yê PDK-I / Rêberîya Şoreşger e... Me di meha Çile (1990) da digel wî hevpeyvînek kir... Ev hevpeyvîne, bi pirsên kûr û dûr û axiftineke dirêj bû sûhbeteke çarnikar...*
*Li jêr , bi kurtebirî raberî we dikin...*

**PORTRE**

" Ez, sala 1934-ê li Mahabadê hatim dinyayê. Xwendina xwe ya seretayî û navînî min li Kurdistanê timam kir... Xwendina zanîngehê jî li Tehranê... Min lîsansê zimanê Frensî wergirt..."

**Serborîya sîyasî**

" Hêj di xortanîya xwe da ez bi mesela netewî ra aşîna bûm... Di serî da divê bêjim ku damezrîna komela JEKAF (Komela Jîyanaweyî Kurd) tesîreke mezin li ser bîr û bawerîya min ya netewî kir. Di wê demê da em hêj nû digihiştin... Li dorberê me gelek mirovên welatparêz û rêzdar hebûn. Peywendîyên me digel wan hebûn. Wan tesîreke baş li ser me dikir. Yek ji wan Mela Ebdula Dawûdî bû ku wî mezintirîn tesîr li ser min kir. Ez li ser bîr û bawerîya netewî ron û agahdar kirim...

Hem jîyana nebaş ya ku xelkê me tê da, zordarîya rejimê û hem jî ew xebata sîyasî ya ku jî alîyê JEKAF ve dihate kirin rûhîyeta me ya netewî geş û bilind dikir...
Paşê PDK ava bû... Komara Mahabadê hate îlan kirin... Ji serî heta dawîyê em wekî xwendekarên xort yên kurd gelek meyildarên wê bizavê bûn... Li gor zanîn û jêhatina xwe me jî mil dida xebata netewî...
Her li wê demê min di hemû kombûn û rûniştinan da axiftin dikirin û helbestên netewî dixwendin... Gelek ji wan di rojnama Kurdistan'da belav jî dibûn...
Wê demê herçend em xort jî bûn, lê dîsa me xwe ji karûbarê sîyasî dûr nedikir...
Şexsîyeta Qazî Mihemed jî tesîr û giranîyek li ser me hebû ku vê yekê hezîya me ya xebatê bilindtir dikir...
Komara Mahabadê herçend 11 meh dom kir jî, lê di wê demê da bawerî û menewîyeta me di dereca herî bilin da bû... Me hemû xortan li wê demê, bi dilxwazîyeke mezin xizmeta Komarê dikir...

Baş tête bîra min ku di maweyê wan 11 meha da li timamî bajêr û di dibistanan da hezkirineke mezin hebû bo Komarê û herroj xelk bi keyf û şahî bû...
Mixabin, meha Kanûna 1946-ê û di 11mehîya xwe da Komar, bi destê dagîrkeran hate hilweşandin û Qazî digel

»»»»

www.arsivakurdi.org

du hevalên xwe hate şehîtkirin. Edî em xortên nû yekser ketin nav karûbarê sîyasî... Ew roj yek îro du ez bi timamî di nav xebata sîyasî da me...
Di ciwanîya xwe da min wek kadirekî PDK di bajêr û gunda da bi veşartî kar dikir... Di vê xebatê da min xelk û welatê xwe gelek baş naskir. Gelek tişt ji gelê xwe fêrbûm... Niha jî hêvî û daxwaza min ewe ku vê tecrûba xwe di xizmeta gel û şoreşa welatê xwe da bi kar bînim...
Li dewrê Şah, 5 cara hatim girtin û 13 sala li zîndana mam. 2 cara jî hukmê îdamê dan min lê har car jî rizgar bûm...
Ji ber xebata sîyasî ez ji Kurdistanê hatibûm dûr kirin û hatina min bo welat qedexe bû... Vî maweyî ez li Tehranê dimam... Heta Şah hilweşîya jî ez li wê derê bûm... Paşî şoreşa Îranê ez vegeryam welat û êdî me bi eşkereyî dest bi karûbarê partîyê kir...
Pişû şoreşê, PDK-I kongra xwe ya 4. pêkanî û ez bûme endamê Komîta Navendî (KN) û Polîtbûro (PB)'yê... Heta kongra 8. ez di serokatîya partîyê da bûm... Di Kongra 8. ya Newroza 1988-ê da ez digel gelek hevalên xwe yên kadirên pêşeng yên partîyê ji fraksîyona Şerefkandî û Qasimlo cûda bûn û me jî karê xwe bi navê PDK-I domand. Piştî cûdabûnê çar meha me jî konfarensa 4. kom kir û 114 delege tê da beşdar bûn û di wê konferansê da navê me bû PDK-I / Rêberîya Şoreşger û rêberîyek nû hat hilbijartin û di kombûna pêşîn ya Komîta Navendî (KN) da ez bûme sekreterê PDK-I / Rêberîya Şoreşger...

Sedemê cûdabûne me jî li ser karûbarê sîyasî û rêxistinî bû... Di partîyê da dîkteorîyeke kesînî û dij-demokratîyeteke bêperwa rûdabû... Qasimlo qet tehemmûla riberiz û nêrînên cûda nedikir... Divîya ku her tişt li gor xwestin û bawerîya wî bibe... Hemû organên partîyê bi xwe ve girêda bûn. Di kar û xebata partîyê da ji tiştên herî grîng heta tiştên sade jî dixwest ku li jêr destê wî bin û bi destûra wî her tişt bibe... Fonksîyona organên partîyê nehêla bû û KN bibû organeke formel... Di xebata sîyasî jî da gelek karên bêyî biryara KN dihatin kirin ku vê yekê rola partîyê zeîf û qels dikir... Qasimlo digel çend hevalên xwe yên **belêgo** wekî fraksîyonekê dixebitîn û dengê riberiz û axiftinên cûda birî bû...
Demokratîyet nehêlabûn di partîyê da... Çi kesê mixalif axiftibîya ji kârê aktîf yê partîyê dihate dûr kirin... Van kiryarên fraksîyonî şertên pêk ve xebitîna digel wan da nehêla û em ji wan cûda bûn. Me cûda bûna xwe li ser belavokeke 10 maddeyî eşkere kir û li nav xelk û hêza pêşmerge belav kir... Vê gava me rûmeteke mezin dît û hem ji kadirên partîyê hem jî ji hêza pêşmerge gelek kesên xebatkar tevî nav rêzên me bûn...
U îro partîya me hêz û qeweta xwe xurt kirîye û xebat û têkoşîna xwe berdewam dike...
Ev deh sale ku em dijî rejima Îslamî ya Îranê şer dikin. Îro jî ev têkoşîna me bi xurtî dom dike..."
........

******* Em dixazin li vê derê behsê dîroka dûr bikin... We behsê komela JEKAF kir... Hindî ku tête bîra me JEKAF li sala 1942-ê hate damezrandin... Dîyare ku vê komelê hêj di demê damezrînê da bala we kêşa ye û li ser we tasîreke baş kirîye...***

**GADANI** - Belê... Hindek rêberên wê komelê tesîrekî baş li ser min kirin... Her li wê demê em bi şev diçûne malên mamostayên kurdîzan û fêrî kurdî xwendin û nivîsandinê dibûn... Piranîya wan endamên JEKAF bûn... Bi roj jî em diçûne mektebên farisî... Ji ber ku wê demê jî kurdî xwendin û nivîsandin qedexe bû...

.............

****** PDK-I ?...***

**GADANI** - Wê demê PDK-Iran nebû...Tenê PDK bû... Paşê bû PDK-I

.........

******* Li ser zemînê JEKAF...***

**GADANI** - Belê, 1946-ê û li ser zemînê JEKAF ava bû... Wê demê gelek karên çandî jî hatin kirin... Du tîyatro hatin lîstin...

******* Wekî "Dayîka Niştiman"...***

**GADANI** - Belê yek "Dayîka Niştiman" bû, ya dî jî "Sultan Selahaddîn" bû...
Ev herdu Şano digel Mahabadê li hind bajarên dî jî hatin lîstin û tesîreke gelek mezin li ser xelk kir, menewîyeta netewî bilind kir...
Wekî PDK ava bûy bi şêweyekî demokratik bernameya xwe hazir kir... Ji ber ku wê demê Ermenî, Cihû û Tirk jî dijîn li Kurdistanê... Lewma, divîya partîyeke demokratîk pêk bê ku mafê wan kêmanîyan jî li ber çav bigre...
Paşê PDK digel Firqa Demokratîk ya Azerbeycan û rêxistinên dî yên Îranê peywendî û danûstandin danîn...

******* Agleton dibêje ku PDK-I bi pêşnîyara Sovyet çêbû...***

**GADANI** - Du cara heyetên partîyê çûn Bakû'yê... Qazî û hevalên xwe di her du caran da jî digel berpirsîyarên Sovyetî li ser hemû meselan şêwirîn... Eve jî tiştekî tebiî bû li gor wan şertan... Lê belê her tişt bi destên kadirên kurd çêbûye... Di wê demê da wan demokrasîyeke kamil bi kar anîne...

******* We behsê demokrasîyê kir... Heke mirov beramberîya demokrasîya sala 1988-ê ku hûn ji alîyê dî cûda bûn û demê Komar'ê bike, hûn dikarin bêjin ku wê demê demokrasî zêdetir bû?..***

**GADANI** - Belê mirov dikare wisa bêje... Ez bi xwe şahidê wê demê bûm ku di maweyê 11 meha da ji alîyê

»»»»

heyeta Komar û Partîyê ve qet wextekê jî neheqî li gel an jî kadiran nehatîye kirin... Di rêvebirîyê da awayê demokratîk bi kar dianîn... Di şertên wê demê da ku sîstema derebegîyê hebû li Kurdistanê, hem Qazî hem jî heyeta îdara Komar'ê dest ji demokratîyetê bernedan... Îro mixabin ku di nav partîyê da em dibînin, kesek radibe neheqîyê li endamekî KN, endamekî sade an jî li pêşmergeyekî partîyê dike ku ev kare cihê daxê ne... Piştî 40 sala ev dijdemokratîyete tête kirin mixabin... Divê ders ji van tecrûban bête wergirtin... Divê hemû hêz û rêxistinên Kurd bizanin ku bi dîktetorîyetê çu tişt hel nabin, divê her tişt di çarçova demokratîyetê û insanî bête helkirin... Ji bo yekitîya hêzên Kurdistanî jî ev yeke gelek grîng e...

..........

**** *PDK-I di saha sîyasî ya Kurdistan da cara yekemîn bû ku wek rêxistinek "parti" ava bû?..*

**GADANI** - Wek partîyeke rêk û pêk, bi program û destûr cara pêşîn bû ku li Kurdistan PDK ava bû... Ji ber vê yekê bû nimûne bo hemû parçên Kurdistanê...

**** *Piştî şehît bûna Qazî, kî bû sekreter?...*

**GADANI** - Piştî şehîtbûna Qazî heta kongra 2. partî bê sekreter bû. Piştî kongra 2. ya li salên 1963-64 Ehmed Tofîq bû sekreter... Heta konferansa 3. ya li sala 1975-ê li bajarê Koyê li Îraq. Piştî vê konferansa 3. Dr. Qasimlo hate hilbijartin wek sekreterê partîyê... Paşê li kongra 3. Qasimlo dîsa hate hilbijartin.

**** *Barzanî bi hêzeke xurt ya pêşmerge beşdarî Komara Mahabadê bû. Mes'ulîyeteke leşkerî jî hebû di demê Komar'ê da... Paşî Komar têkçû, Barzanî digel hêza xwe vegerîya Iraqê û paşê jî çû Sovyet... Gelo dijayetîyek hebû di navbera Barzanî û serokên Komara Mahabadê da?...*

**GADANI** - Baş li bîra min e wekî Barzanî digel hêza xwe hatin bajêrê Mahabadê... Xelkê Mahabadê rêzdarîyeke mezin nîşanî wan dabûn... Li Mahabad, Şino, Nexede û gundên dorberê van bajêra hatin cih kirin... Xelkê me teveccûhek mezin nîşanî wan da... Herweha hatina wan tesîreke gelek baş li ser xelkê dikir. Di nav wan da gelek kesên navdar û ronakbîr jî hebûn; wekî mamosta, wekî pisporên leşkerî... Mesela li bîra min e; Mîr Hac, Mistefa Xoşnav, Îzzed Ebdulezîz, Seyit Ezîz, Mihemed Mehmûd di nav ertêşa Îraqê da xebitî bûn, ew jî digel Barzanî hatibûn ku hevkarîya Komara Mahabadê bikin... Ji ber vê yekê di pêkhatin û tenzîm kirina Komara Mahabadê da tesîr û xizmeteke mezin ya wan jî hebû. Ji ber ku hêzeke xurt bûn... Hêzeke şerker bûn...
Gelek hevkarî kirin. Min bi xwe qet nebihîst ku di navbera Barzanîya û kurdên me da ferq û cûdahîyek bûye... Heta xelkê erzaqê herî baş digihande Barzanîya... Zarokên wan jî digel me dixwendin... Di gelek mes'ulîyetên partîyê da jî beşdar dibûn... Barzanî bi xwe jî cihgirê kumandarê hêza çekdar bû. Ew efserên digel wan hatî jî hemûyan li hêza çekdar da mes'ulîyet wergirtin... Kadirên wan yên sîyasî jî di nav partîyê da dixebitîn. Belê tiştek heye ku Barzani nedixwest Komar weha lê bêt... Wî dixwest ku berxwedan çêbe... Belê di şertên wê demê da me nikarî berxwe bidin.
Lê belê di roja dawî ya Komarê da her çi tiştê leşkerî hebû digel zexîre jî dane Barzanîya... Wan jî bi mêranî berxweda û ber bi Nexede û Şino ve çûn...
Gelek ji wan jî şehît bûn li Îraqê... Barzanî jî digel hejmareke bilind ya heval û pêşmergeyên xwe bi rêveçûneke dirêj û dîrokî derbaz bûn çûn Sovyet... Heta hilweşîna paşayetîya Iraqê li wê derê ma, paşê hat Iraqê û di maweyekî kurt da şoreşê destpêkir... Piştî şoreş destpêkir partîya me gelek hevkarîya wan kir... Belê mixabin, hindek bûne sebebê wê yekê ku ev peywendîya baş, têkçû...
Peywendî xirab bûn... û ji vê yekê partîya me gelek zerar dît û gelek kadirên wê yên pêşeng hatin şehît kirin...

.......

**** *Di sala 1962-ê li Kurdistana Îraqê şoreşê destpêkir û partîyê çek hilgirt... 1967-68-ê jî Silêmanê Muînî û hevalên xwe li Kurdistana Îranê dest bi şerê çekdarî kirin.. Helbet tesîreke pozîtîf li ser pêngava Silêmanê Muînî'yan hebû... Silêmanê Muînî û hevalên xwe bi biryara partîyê çek hilgirtin an ne... Partî muwafiq bû, herweha Qasimlo?..*

**GADANI** - Wê demê Qasimlo her li nav partîyê nebû... Li ser vê yekê yek - du name jî hene... Ku yek ji wan Şerifzade bo Qasimlo nivîsîye... Ji ber ku wê demê Qasimlo li derveyî welat bû...

Esas Qasimlo gelek kêm li Kurdistan maye... Ew her li derveyî welat bû... Berî şoreşa giştî Îranê ya 1979-ê du meha hat Kurdistanê... Heta ku sekreterê partîyê jî bû zêdetir li Frense dijîya... Neku li Bexda... Ji ber vê yekê ew muwafiqî serhildana Muînî'yan nebûye... Şerîfzade ji Qasimlo dipirse ; "bo çi tu xwe bê deng dikî..."
Heta niha jî ew name wisa veşartî maye û bersiva wê namê nehatîye dan... Bi bawerîya min dîyare ku Qasimlo bersiveke negatîf daye û nexwestîye alîkarîya wan bike... Ji ber vê yekê nehatîye Kurdistanê... Heke wê demê bihata Kurdistanê, belkî bikarîya hevkarîya wan jî bike...

..........

**** *Serhildana dijî Şah li Îran li sala 1977-ê destpêkir... Taybetî li zanîngeha Tehran'ê xwendekaran bizaveke mezin pêkanîn dijî Şah... 78-79-ê jî ev bizave bilind û fireh bû... Tesîreke PDK-I hebû di destpêka vê bizavê da?...*

**GADANI** - Divê li vê derê wekî senedeke dîrokî bêjim, ku dawîya cunta meha Gelavêj (Tebax) li sala 1953-ê ku bi destê Şah dijî Museddiq çêbû... Bizava Îran û

»»»»

Kurdistan'ê bi giştî têkçûbû... Belê paşê li Kurdistan bizav baştir pêşve çû ji deverên dî yên İranê... Lê belê bi şêweyê giştî li Kurdistan jî li seransrî İran jî bê dengîyek hebû... Lê belê serhildana 1967-68-ê yekem serhildana çekdar bû dijî rejima Şah... Ev serhildane ji ber ku ya kurd bû, mixabin gelek deng veneda... Halçi ev serhildana 67-68-ê bû çirûskek li hemû İranê... Çirîkê Fedaî, paşê dest bi şerê çekdarî kirin... Micahida jî her wisa... Gelek grubên dî yên piçûk jî... Van hemû rêxistina jî ji serhildana me ya 67-68-ê kelk wergirtin... Paşî têkçûna serhildana 67-68-ê jî bizava me dom kir... Gerçî gelek bi rêk û pêk nebû, lê belê xebat her berdewam bû...

.......

******** *Kak Celîl, serhildana sala 1977-ê dijî Şah bi rêxistinî bû an xwe bi xwe destpêkir anku spontane bû an ne?... Di navbera hêzên wê demê da peywendî hebû...*

**GADANI** - Hêzên mezhebî ji kevin da bi rêxistinî û hêz bûn... Ewan li bin erd tiştek hebû... Hindek rêxistin û grubên dî jî hebûn ku her yek ji wan li gor program û desturên xwe kar dikir. Lê belê mirov nikare bêje ku ew hemû xelkê serhilday bi rêxistinî bû... Di esasî da bizava xelkê bi piranî xwe bi xwe bû, anku spontane bû... Lê bizaveke wisa bû ku roj bi roj fireh û mezin dibû... Li ser axûnda (Ayetullaha) û tesîra wan ya li ser serhildanê gelek riberiz dihate kirin... Hevalên me yên Faris û Azerî û herweha yên Kurd car car digotin ku ev axûnde, hindek cara rêçûnên me têkdidin. Xeter e ku ew bêne ser kar... Rastî jî me qet ihtimal ne dida ku axûnd dê bibine yêk û dê rêxistina wan hebe...

******** *Anku eve xeletîya we hemûyan bû...*

**GADANI** - Belê, hemû hêzên İranî û em heta ez bi xwe jî di vê xeletîyê da bûn... Me hemûyan jî fanatîzma mezhebî ya Şiîtîyê (Elewîtîyê) ya hezar salî ne girtibû berçavên xwe...

******* *We qet texmîn nedikir ku Şiî (Elewî) li binerd xwe rêz dikin?..*

**GADANI** - Qet. Me texmîn nedikir ku ew weha li binerd bi rêxistinî ne û dê qudret û iqtidarê hilgirin destê xwe... Eve rastîyeke ku hemû hêzên sîyasî xafilgîr bûn... Helbet yên ku bîr û bawerîyeke qaîm heyî rêzên xwe zû ji wan cûda kirin, lê yên çu bawerî neyî teslîmê bîr û bawerîya rejima Komara İslamî ya axûnda bûn... Digel wan bi rê ketin, hevkarîya wan kirin. Belê ev hevkarîya wan bû sedemê têkçûn û windakirina gelek kadir û endamên wan hêza...

******** *Mirov dikare bêje ku bi hêztirîn qewet Ayetullah bûn di destpêka serhildana dijî Şah da?...*

**GADANI** - Şik tê da nîne... Derket ku ew ji hemû rêxistin û gruba bi hêztir bûne... Wan bi nezerîyeta Şiîyetê tesîreke mezin li xelk kirin û ew bi vê benda mezhebî bi xwe ve girêdan...

******** *Belê, dîyare ku bi hêz bûne... Ji ber ku çawa Şah çû, gelek ne kêşa Şapur Bextîyar jî çû, Mela (axûnda) ji nişkê ve iqtidar ne hilgirte destê xwe... Ew hazirî vê yekê bûn... Bi hêz û rêxistinî bûn... Helbet di vê derê da rola mezin ya Xumeynî ye... Ji ber ku ew hêj li İranê, dest bi karê rêxistinîya binerd di nav axunda da kiribû... U paşê jî li Necef'ê li İraq, ev kare xurttir domand... Wexta hatîye Paris'ê ji xwe gavên mezin avêtibûn...*

**GADANI** - Belê, her wisa bûye... Helbet çawa hatîye sirgûn kirin, xerîkî karê rêxistinî bûye... Hukmeta Şah ji berê ve dizanî ku ew mijûlî karê sîyasî û rêxistinî ye... Lewma sirgûn kirin...

******** *Anku mirov dikare bêje ku Xumeynî ne tenê rêberekî dînî bûye, herweha ew rêberekî sîyasî û rêxistinî jî bûye...*

**GADANI** - Belê, ez jî wisa dibêjim... Şik di vê yekê da nîne... Mirov nikare bêje ku ew tenê rêberekî dînî bû... Mirovekî sîyasî bû... Heke wisa nebûya, çawa dikarî rêxistineke ewqas xurt dayne û paşê jî iqtidarê hilgire destê xwe... Herçend mirovekî paşkevtî û kevneperest jî bûye, lê belê mirovekî sîyasî jî bûye...

******** *Paşî Necef Xumeynî hate Paris'ê... Bizava gelên İran'ê gelek bilind bû... Şah bi zorî bi reva xwe ra gihişt... Hukmeta Şapur Bextîyar jî nikarî xwe zêde ragire... Xumeynê wê demê car cara peyamên baş jî didan ji bo gelên İran'ê... Digot ku heke ew iqtidarê wergirin, dê mafê wekhevîya gelên İran'ê bidin... Wê demê PDK-I jî teyîda Xumeynî dikir...*

**GADANI** - Belê me jî teyîda Xumeynî dikir... U gelek cara jî me piştevanîya xwe bo dîyar dikir... Herweha hemû hêzên İranê jî wisa... Ji ber ku ew wekî mihwerê wê serhildanê bû... Me nedikarî mihwer li pêşçav negirin... Lê belê, me pêşnîyarî gelek hêza kir ku wê demê di navbera hêzên pêşkevtî da hevkarîyek pêk bê... Lê belê, wan digot ku hevkarî dê bi xwe pêk bê... U dereng man... Helbet vê yekê jî keysekî nedîtî da axûnda (mela)... Heke me hemû hêzên İranî di destpêkê da hevkarî pêk bianîya, wê demê qet nebe di navbera me û axûnda da dê koalîsyonek çêbiba... Lê belê hêzên çep ev yeke baş nedîtin... Ji xwe hindeka digot ku hevkarî ne pêvîst e... Bi bawerîya min heke hevkarîyeke xurt pêk bihata şert îro weha nedibûn... Di wê belavîya me da Xumeynî jî xwe li ser soz û qewlên xwe negirt... Piştî hat İran'ê û iqtidar hilgirte destê xwe; em wek heyeta PDK-I, Qasimlo, Emîr Qazî, ez û digel çend hevalên dî çûne nik Xumeynî ku pirsa me kurda baxivin... Me, ew qewlên ku dayî anîne bîra wî... Belê wî her tiştek digot ; "em hemû İslam in..." tiştek dî jî nedigot... Ne kurda, ne azerîya û ne jî kesê mafê azadî û demokratîyetê nebûn... Ne kafir ne İslam çu

»»»»

kesê... Bo Xumeynî İslam bûn her tişt bû...
Helbet neku pirs nedizanî, le belê xwe bi ser ve nedibir... Wî di bingeh da bawerî bi hiquq û demokratîyetê nebû... Rastîyek jî ewe ku di navbera demokratîyet û bîr û bawerîya İslamî da dijayetî heye... Ev herdu bawerîye dijî hev in... Heke demokrasî hebûya qet Xumeynî li iqtidarê cih digirt!...

...........

******** *Komele, piştî şoreşê çêbû?...*

**GADANI** - Komele piştî şoreşê çêbû... Herçend ew dibêjin berî şoreşê çêbûye, lê dîsa ne rast e...

******** *Kak Celîl, dîyare ku rejima İslamî dizanî ku PDK-I li hemû Kurdistanê bi hêz û qewet e û insiyatîf di destê wê da ye, lewma şerê "sê mehî" destpêkir daku hêza partîyê bişkêne...*

**GADANI** - Belê... Bi rastî jî wisa bû... Berî şerê "sê mehî" li Tehranê konferanseke gelên İranê çêbû... Di wê konferansê da nimayendên hemû gelan hebûn... Li wê derê biryar hate wergirtin ku konferansa duyemîn bi berfirehtir li bajêrê Mahabadê pêk bê...

Di destpêka şerê sê mehî da me hazirîya vê konferansê dikir... PDK-I tecrûbeyeke mezin hebû û piranîya Kudistanê jî di destê partîyê da bû... Hukmeta merkezî li Kurdistanê nemabû... Di wê konferansê da dê biryar hatiba wergirtin ku li seranserî İranê şer û têkoşîna çekdarî destpêbike... Hukmetê ji ber vê yekê fermana şer da ku hem konferansê têk bide hem jî wekî we jî gotî hêza partîyê bişkêne û dîsa Kurdistanê destgîr bike... Belê negihiştin armanca xwe. Gelê kurd berxwedaneke xurt nîşan da em serketin. Hukmet mecbûr bû û daxwaza "mûzakerê" kir...

******** *Di şerê sê mehî da mirov dikare bêje ku partî bi timamî serkevtî bû?...*

**GADANI** - Belê. Serkevtineke berbiçav bû... rewşeke nû hate pêş bo patîyê... Xelkê jî ev yeke dît û zêdetir piştevanîya partîyê kir... Wekî nimûne ez bêjim ; piştî şerê sê mehî hilbijartina parlamentoyê çêbû... Di wê hilbijartinê da li çend bajêrên Kurdistan ku me kandît dîyar kiribûn, dengên herî zêde kandîtên me anîn...

******* *Çend nûner anîn?..*

**GADANI** - Xenî Bilûryan, Mistefa Hicrî, Qadirê Ebdî û gelekên dî...
..........

******** *Kongra 4. li 1980-ê çêbû?...*

**GADANI** - Piştî şerê sê mehî li bajarê Mahabadê çêbû... Li meha adara sala 1980-ê.

******** *Li kongra 4. hejmara delega zêde bû?...*

**GADANI** - Belê. Berîntirîn kongra partîyê bû...

..........

******** *Kak Celîl, biryardana amadekirina hêza pêşmerge berî şerê sê mehî bû an ne?..*

**GADANI** - Berî şerê sê mehî tenê biryar hebû ku hêza çekdar hebe... Neku biryara hêza pêşmergê rêk û pêk... Wê demê ez û Sergurd Ebbasî ji Tehran hatin Mahabadê ji bo vê pirsê û herweha ku Padîgana Mahabadê jî destgîr bikin... Çiku di nav hevalên me da mixalifîya li ser girtina Padîganê hebû...
Bi bawerîya me eve nêrîneke şaş bû... Çiku keysekî baş bû dê ji dest biçûya... Ji ber vê yekê em hatin û nêzîkî deh roja riberizî vê pirsê bûn û me peywendî digel hevalên xwe yên di nav Padîganê da danî. Padîgana Mahabadê yek ji mezintirîn binkê leşkerî yê rejimê bû li Kurdistanê. Me biryar da û Padîgan girt.

Piştî destgirîya Padîgana Mahabadê em jî bûne xwedîyê gelek çek û wesîlên dî yên leşkerî... Berî ku me Padîgan girtî çekên me gelek kêm bûn... Lê piştî me Padîgan girt êdî çekên me jî zêde bûn û me li pêşmerge belav kirin, hejmara pêşmerge jî zêde bû...

******** *Amirhêzê pêşîyê kî bû?...*

**GADANI** - Di şerê sê mehî da berpirsê pêşmerge Sergurd Ebbasî bû... Çiku ew di rojên dawîyê da herweha berpisiyarê Padîgana Mahbadê bû... Paşê hejmara hêza pêşmergan zêde bû... Wek Hêza Aware li Pîranşehr (Xane), Hêza Muînî li Serdeşt, Hêza Pêşewa li Mahabad... Ev sê hêze yên pêşîyê û yên bingehîn bûn... Paşê li Pawe, Hewreman, Merîvan, Bane û paşê jî li Soma - Bradosta hêzên nû hatin danîn... Anku bi kurtî piştî şerê sê mehî me hêza pêşmerge bi rêk û pêkî danî...

******** *Wê demê bajêrên Kurdistanê hemû di destê partîyê da bûn...*

**GADANI** - Beşekî herî zêde di dest, partîyê da bûn... Li bajarê Sine nîv be nîv bû. Beşek di destê partîyê da, beşê dî jî di destê Komelê da bû... Lê belê her li wê derê jî sîstema Şûrayî hebû...

******** *Kak Celîl, piştî kongra 4. xebata partîyê pir pêşda çû, hêza pêşmerge xurt bû... Paşê jî şerê İran û İraq hate pêş...*
*We dijî şerê İran û İraqê biryar wergirt... We xwest alîkarîya İranê bikin?... Biryareke wisa hebû?..*

**GADANI** - Me biryar nebû ku alîkarîya dewleta İranê bikin... Me got ku heke hukmeta İranê mafê otonomîyê bidete kurda, hingê em dê di vî şerî da piştgirîya dewletê bikin... Helbet dawîyê ne wan otonomî da, ne jî dijî wan

»»»»

şerê me rawesta... Şer û xebata me her dom kir...

..........

**** *Başe, sedemê cûdabûna Xenî Bilûryan û hevalên wî çi bû?...*

**GADANI** - Ya rastî ew pirtir li bin tesîra TUDEH'ê man... Berî ku ew cûda bin heftûyekê kombûneke fireh ya partîyê hebû û wan di wê kombûnê da qet behsê cûdabûnê an jî rexneyekê nekirin...

**** *Dîyare ku di wê cûdabûnê da tilîya TUDEH'ê hebûye...*

**GADANI** - Bê şik...

..........

**** *Kongra 5. biryarek da ku hûn dijî rejima Xumeynî ne û şerê çekdarê dom dike... Biryara kongra 4. hate guhertin... Eve çawa çêbû?...*

**GADANI** - Dîyare, me di kongra 4. da biryar da ku têkoşîn bidome, lê belê me şîara hilweşandina rejimê neda, çiku peywendî hebû, gotûbêj hebû digel rejimê... Lê belê, di kongra 5. da eşkere bû ku rejim qet mafê gelê me nade û şerê xwe jî didomîne li Kurdistanê û dixwaze me serkut bike... Ji ber vê yekê di kongra 5. da me şîara hilweşandina rejimê da... Helbet eve tiştekî nû bû bo me...

**** *Anku we stratejîya xwe guhart...*

**GADANI** - Belê... Li wê wextê gelek ixtilafên rejimê digel hind hêzên dî yên Iranî jî çêbû... Digel Micahidîna bi timamî têkçûbû... Digel Çirîka û paşê jî digel Tudeh'ê... Edî eşkere bibû ku Xumeynî dixwaze hukmê xwe wekî İmparatorîyeke İslamî zêdetir binecih bike... U helbet tiştekî gelek tebiî ye ku li hember dijminekî ewqas kevneperest ; hêzeke şoreşger divê qetîyeta xwe nîşan bide... Ji bo vê yekê me îlan kir ku divê peywendîyên me zêdetir bin digel hêzên dî yên Iranî jî... U ew şîara hilweşandina rejimê heta niha ji bo me berdewam e, çiku em qet hêvîyekê tê da nabînin ku ev rejime mafek bide gelê kurd... Ji xwe yek sedem jî ev bû ku em ji fraksîyona Qasimlo cûda bûn... Wan her dixwest digel rejimê pêkhatinê bikin... Gotûbêjên wan her dem dom kirine digel rejimê... Lê belê, rejimê di êrişên xwe da qet sistîyek jî nedikir... Ma, Qasimlo jî di gotûbêjeke wisa da serê xwe nedanî, xwe neda kuştin?... U niha jî ew li ser van hemû bûyera dîsa dixwazin gotûbêjên xwe digel rejimê bidomînin...

**** *Kak Celîl, Piştî kongra 5. pêkhat, we biryar da ku cepheyek digel Micahidîna pêk bê... U Beni Sadr jî di nav da... Lê belê, Beni Sadr di maweyê şerê sê mehî (1979) da hem serok Komar bû hem jî fermandarê hemû ertêşê bû... Dijî gelê kurd fermana şer wî dida... Axir, di wê biryara kongra 5. da taybetî ji ber Beni Sadr, dijayetîyek xûya nake?...*

**GADANI** - Me wisa dizanî ku Micahidîn, hêzeke sereke û mezintirîn e li Iranê.. Di serî da qudreta wan di nav rejimê da gelek hebû... Ji xwe derketina Recewî û Beni Sadr ji firokxana Tehranê ku wê demê rejim wekî jan didan li wan digerîya, qeweta wan nîşan dide... Qasimlo pir dixwest ku digel Micahidîn hevkarîyê dane û bi bawerîya min jî rast bû... Beni Sadr hingê digel wan bû... Ji bo vê yekê me nedikarî ji wan biqetînin...
Me texmîn û hêvî dikir ku belkî, Beni Sadr jî li kiryarên xwe yên neqenc yên kevin rexne bigre û bête ser rîyeke baş û rast... Lê belê, paşê derket ku ji bo pirsa otonomîyê jî mixalif bûye...
Ji ber vê yekê, di kongra 6. ya PDK-I da me biryar da ku em nameyekê rêbikine "Cephe" (Me jê ra digot Şûra) ku bawerîya Beni Sadr ya li ser otonomîyê ron bike û wî ji nav cephe derbêxe... Heta, Qasimlo bi xwe ji bo Recewî name rêkir ku divê an Beni Sadr di "Şûra" da be an jî PDK-I... Ew wezîfa name danê jî partîyê dabû min... Lê belê, paşê Qasimlo û fraksîyona xwe li ser vê çendê ez sûcdar kirim, ku gûya ez bûme sebebê biryar dana derkirina Beni Sadr ji "Cephe"!... Halçi ew biryara giştî ya partîyê bû name jî Qasimlo bi xwe nivîsî bû... Bi bawerîya min xwestina derkirina Beni Sadr karekî rast bû û niha jî divê rojekê Beni Sadr bête dadgah kirin ji ber wan kiryarên xwe yên dijî gelê kurd...

..........

**** *Başe kak Celîl, li ser wê biryara partîyê, Micahidîna çi gotin?...*

**GADANI** - Ew jî li ser wê bawerîyê bûn ku divê Beni Sadr bête derkirin... Esas di serî da wan pêşnîyar kiribû û ew jî li hêvîya nêrîna me bûn... Wexta ev yeke me bihîst, êdî me go em dubare dixwazin ku Beni Sadr bête derkirin ji cephe...

..........

**** *Kak Celîl, talîyê hûn jî li kongra 8. ji partîyê cûda bûn... Di kongra 7. da hûn û ev hevalên ku we niha bi hevra partîyek nû avakirîye, we dijayetîyeke ramanî û îdeolojîkî digel Qasimlo û gruba wî hebû?...*

**GADANI** - Dijayetîya ramanî û îdeolojîkî her li pêş hebû.. Lê belê em wisa diramîn ku hêdî hêdî awayê demokrasîyê cih bigre û karê dîktetorîyê dawî bêt... Lê belê neku dîktetorîyet bi dawî hat, roj bi roj zêdetir bû... Qasimlo li her kongrê planek nû derxist ku hindek hevalan ji partîyê tesfîye bike...
Di kongra 4. û ya 5. da jî Qasimlo bû sebebê gelek hevalên xebatkar ku ji rêvebirîya partîyê dûrkevin... Li

»»»»

kongra 6. da Qasimlo pirseke "sosyalîzma demokratîk" anî halê ku di wê demê da ne pirseke aktûel bû... Çiku pirsa me, pirseke netewî bû, pirsa xelkê kurd bû, neku biryardana "sosyalîzmeke" piştî 50 sala dê çawa be, yan jî çawa nabe bû... Ku îro piştî 70 sala "sosyalîzm" tête mûnaqaşekirin... Ev pirse, Qasimlo wê demê anî kongrê û bû sebebê hindek hevalan ku ji partîyê cûda bûn... Nêzîkî sed kadirên xwedî tecrûbe digel gelek pêşmerga rûniştin... Ne razî bûn... Dîsa me nexwest problemeke mezintir derbêxin û me yêkitîya partîyê li ser hemû tiştî ragirt... Di kongra 7. da hindek pirs hatin pêş ku Qasimlo dixwest xetê rastajoyî (rastrevî) bike hakimê partîyê... Pirsa peywendî danînê digel Amerîka anî halê ku heta wê demê qet di rêvebirîyê da nehatibû riberiz kirin... Ji ber ku ev pirse di nişkê da anî halê, em ketin şikê ku ew dixwaze çi bike... Hem jî di demekî wisa da... Wê demê seferek bo PERU jî kiribû...

******** *1986-ê bo kombûna Enternasyonala Sosyalîst çûbû...*

**GADANI** - Belê... Bi bawerîya me li PERU hindek peywendî danîbûn û wî dixwest sefera xwe ya PERU'yê bi şêweyê serkevtî bide teyîd kirin... Di plenûma piştî sefera wî ya PERU da, wî dixwest em biryarek bistînin ku sefera PERU sefereke baş û serkevtî bûye... Mela Ebdula Heyakî dij vê yekê derket û got ; "Tiştekî seyr e, tu hercar sefer dikî û qet naxwazî em biryara teyîd kirinê bidin, lê belê dixwazî li ser vê seferê biryareke partîyê bidî wergirtin û bi me bidîye imza kirin..." Qasimlo li ser vê reaksîyonê gelek aciz bû, dij Mela Ebdula derket heta qesên neqenc jê ra gotin...

Ez dij Qasimlo derketim û min got ku di heqareta li Mela Ebdula Heyakî da neheq e... Heqê rexnegirîya wî jî heye... Li piştî kongra 7. jî hindek seferên wî bo derveyî welat ku çû Amrîka û peywendî girêdida, em xistin şikê... Bi bawerîya min ew tûşî rastajoyeke wisa bibû ku pirsa zehmetkêşa û karkeran û rêncberên Kurdistanê bo wî û fraksîyona wî qet grîng nebû... Ew zortir li ser kesên feodal radiwestan û bi ronakbîrên digel wan mijûl dibûn... U herweha xerîkê derxistina kadir û endamên baş û zîrek bûn... Ca an ji Ewrupe taahhûdek wergirtibûn û ji ber hevpeymanîya wan ev kare dikirin, an jî ji bo pêşeroja xwe ev kiryarên nedemokratîk dikirin ku hindek kes di partîyê da nemînin... Heta niha, Qasimlo di maweyê sekreterîya xwe da ku nêzîkî 10-15 sala dike, 72 kes ji endametîya rêvebirîya partîyê avêtine...

U ev hejmare, hejmareke gelek pêşçav e ji bo partîya me... Bo çi hinde kesên zana û xwedî tecrûbe ji partîyê derdiçin?...

Li kongra 8. da jî dewama ev kiryarên xwe kirin... Bi taybetî Qasimlo lîste anî halê... Bi awayê "lîste" dixwest ku Komîta Navendî (KN)' yek li gor xwe bide hilbijartin ku di wê lîstê da hindek kes hebûn ku endamê Restaxîza dewrê Şah bûn... Hindek du-sê sal berî kongrê caş bûn... Hindek jî hebûn ku ne layiqî KN bûn û qet xizmeta wan di partîyê da nebû... Lê belê ev kesane tenê "Belêgo"yên Qasimlo bûn... Em jî helbet dijî vê yekê derketin û me got ku ev metode ne metodekî demokratîk e... Gerçi em heşt hevalên ku niha bi hevra ne jî di wê lîstê da bûn lê dîsa me got ku di nav PDK-I da adetekî baş heye ku ew jî hilbijartina demokratî e... Bo çi hûn vî adetê baş têk didin... Bila her kes azad be di hilbijartinê da, neku tu hilbijêrî... Bêjî "ez filankes kandît dikim, divê tu reyî bidîyê..." Eve ne demokratîk e, dijdemokratîk e... Di encam da ewan KN'yek hilbijartin ku ji delega %51 reyî dane wê lîstê. Lê belê %49 delege jî dij derketin û di wê tertîba Qasimlo da beşdar nabûn... Bi nêrîna min ev metode di qet partîyek faşîst da jî nîne ku %49 delega çu nûner nebin, lê belê %51 hemû nûner hebin... U eşkereye ku eve dijdemokratîyet e û di bingehîn da jî, hilbijartinekî demokratîk nebû...

Lîsteyeke mecbûrî bi delega dayne qebûl kirin... KN ne hatîye hilbijartin, ji alîyê Qasimlo ve hatîye tayîn kirin...

******** *Anku hûn dibêjin "hilbijartin" bûye teyîda* ***"Belêgo"*** *ya...*

**GADANI** - Belê, bûye teyîda "Belêgo"ya... Eve jî tiştekî gelek xelet e... Vê yekê tesîreke pir xirab li ser piranîya hevalên partîyê kir... Piştî kongrê jî Qasimlo û Dr. Seit Şerefkendî digel fraksîyona xwe, program û destûra partîyê li gor xwestekên xwe guhurandin, revîze kirin... Bizava me jî, bizaveke dijî dîktetorîyeta di nav partîyê da bû... Ev bizava me bizaveke bi mes'ulîyet jî bû. Heta wê demê em wek PDK-I bi tenê di kuncikekê da bûn... Peywendîyek ne digel hêzên Kurdistanê ne jî digel yên İranê hebû... Başe wekî em dibêjin "Demokrasî bo İran, otonomî bo Kurdistan" ku niha jî şîara me wisa ye, hingê me hewcetî bi hemû hêzên İranî heye...

Divê digel hêzên Kurdistan hevkarîya me hebe... Em li ser wê bîr û bawerîyê bûn... Lê belê ew li ser vê bîr û bawerîyê nebûn... Piştî em ji wan cûda bûn û me da xûya kirin, me digel hemû hêzan dostayetî danî... Helbet em nabêjin, em dê rejimê hilweşînin, lê herweha di derbarê peywendî danîn û hevkarî çêkirinê da em gelek pêşve çûne... Her di serî da me şerê digel Komelê bi biryara yêk alî da rawestandin... Lê belê niha Fraksîyona Qasimlo û Şerefkendî digel me şer dikin... Dîktetorîya di nav partîyê da gihiştibû dereceyeke ewqas bilind ku qet endamek ji rêvebirîya partîyê nedizanî ka malîyet û imkanên partîyê çi ne...

.........

******** *Kak Celîl, dîyare ku Qasimlo gruba xwe jî paşdestê xwe kirîye.. Anku qet nehênîyên ku divê ji alîyê organa rêvebir ya partîyê bêne zanîn jî ji bo nêzîktirîn hevalê xwe negotîye?...*

**GADANI** - Nexêr, bi daxewe, digel wan jî dûrûst nebûye... Gelek kar dikirin lê em pir dereng pê dihesîyan... Mirovekî serero, tekrev û dîktetor bû... Berê, li destpêka şoreşê Qasimlo î wisa nebû, baştir bû... Dîyare

Dûmahîk di rûpela 14 -a da

Politik düzeyde sağlanan ayrı örgütlenme artık sosyal ve kültürel alanlarda da başarılmalıdır. Geleceğin bağımsız toplumunun, bağımsız kurum ve kuruluşlarının nüvelerinin şimdiden oluşturularak halkın bağımsızlık bilincinin geliştirilip güçlendirilmesi gerekir...

# Kürdistan'da Ö
# Sosyo-Kültü

**"Direnmek yaşamaksa, örg**

Hasan ÇELİK

*Örgütlenme, Kuzey Kürdistan devriminin tüm aşamalarında ivediliğini ve önemini sürekli koruyan bir sorundur... Klasik deyişle; zaten devrimci savaşım örgütlenmeden olamaz... Kuşkusuz devrim sorunu sonuç itibariyle bir iktidar sorunu olduğuna göre örgütlenmenin beyin ve omurgasını politik örgütlenme oluşturur... Ve bugün Kürdistan politik arenasında sayısı birhayli kabarık, parti olarak yapılaşmış veya "hareket", grup ve "çevre" olarak kümelenmiş politik örgütlenmeler var. Örgütlerin tüm bu nicel kabarıklığına karşın ortada hala ciddi bir örgütlenme sorunu duruyor... Devrimin lokomotof gücü olarak ; güçlü ve yığınsal tek parti düzeyinde olsun, pluralist yapısıyla birçok örgütten oluşan cephe olsun, nihayetinde belirleyici olan politik örgütlenmedir... Örgütlenmenin bu boyutu tartışma götürmez... Ne ki, kitleler yalnız politik örgütlenme içine alınarak örgütlenemezler...*
*Politik öncü ister homojen yapı oluştursun, ister heterojen yapı kursun kitle içinde yapısal genişlik sağlamaya çalışırken "seçici" davranır... Bu bakımdandır ki, gerek güçlü örgütlenmelere sahip devrim süreci yaşayan ülkelerde olsun ve gerekse devrimi başarmış ülkelerde olsun parti veya değişik biçimiyle hareket veya cephe, toplumun görece az bir kısımını kendi direk politik yapısı içinde örgütleyebilir...*
*Geniş kitleleri örgütlülük zemininde tutmanın yolu sadece politik örgüt aracılığıyla olmaz... Çünkü kitlelerin geniş bir bölümü devrimi yürüten veya başarmış örgütün politikasını benimseselerde üye olup direk içinde olmayı çoğu zaman istemeyebilirler... Ama kitlelerin örgütlendirilebileceği değişik araçlar oluşturulabilir. Toplumun değişik kesim ve gruplarının ivedi istemlerini programlayan, özlük sorunlarıyla uğraşan organizeleşmelere gidilirse daha yaygın kitlesel örgütlenmeler yaratılabilir... Ve kitleler, çok çeşitli örgütlenmeler yaratılarak organize edilebilirler...*

*Bu kısa yazımızın kapsamında örgütlenmenin sosyo-politik boyutunu ele almayacağız... Kitleleri daha geniş yelpazede örgütlenme sürecine sokan bir diğer önemli araç olan sosyo-kültürel boyut üzerinde kısaca durmaya çalışacağız...*

***Sosyo-Kültürel Örgütlenmenin Önemi...***

*Kürdistan da kitlelerin örgütlenmesinde önemli bir yanılgı var ve bu kronik bir şekilde hala sürüyor... Bu da örgütlenmenin politik boyutunda çakılıp kalınmadır... Kitlelerin örgütlendirilmesi gibi zor ve karmaşık bir görev, kısa yoldan örgütlemelere gidilerek çözülemez... Toplumu tek tip örgütlenmeler içine sokup harekete geçirmenin olanağı yoktur...*
*Burada öne çıkan yanılgı toplumun iyi ve sağlıklı bilinememesi hatta tanınamamasından kaynaklanıyor... Oysa önüne devrim yapmayı koyan bir politik gücün ; toplumun tüm kesim, katman, kategori ve gruplarını iyi analiz etmesi gerekir... Bu kapsamda sağlıklı bir çözümleme yapılmazsa belirtilen bu kesimlerin istem ve özlemleri de saptanamaz... Tüm toplum kesimleri güncel ve ivedi sorunlarından koparılarak sadece görece uzak istemlerini çözmeyi önüne koyan örgütlenmeler içine kolayca çekilemezler... Burada öne çıkarılması gereken, toplumu tümden harekete geçirici mekanizmaları yaratmak ve örgütlenme ağını bu temelde yaygınlaştırıp güçlendirmektir... Örgütlenmenin bu boyutunda yakalanması gereken halka sosyo-kültürel örgütlenmedir... Yelpazesi hayli geniş olan sosyo-kültürel örgütlenme, toplum kesimlerinin demokratik, sendikal, akademik ve mesleki istem ve sorunlarını programlaştıran ve çözmeye çalışan organlardır... Kürdistan'da gerek paralel, gerekse dikey ama her iki halde de kitlelerin yaygın bir şekilde örgütlendirilmeleri toplumun özellikle çalışan kesimlerinin en genelde özlük sorunları ve giderek demokratik istemlerinin kazanımı için statülerine uygun örgütlenmelerin yaratılması yaşamsal önemdedir... Örneğin işçilerin ekonomik ve demokratik örgütlenmeleri olarak sendikalar ne kadar önemliyse, köylülerin kooperatiflerde örgütlendirilmeleri o derece önemlidir... Aynı şekilde gençlik kesiminin, öğrencilerin, memurların, akademisyenlerin, esnaf ve sanatkarların, kadınların vb... Bu türden sosyal ve kültürel örgütlenmelerin yaratılması ve yaygınlaştırılması kitlelerin tümden organize edilmeleri bakımından öncelikli veya sonralıklı olsun bir bütün olarak savaşım sürecinin yüklediği görevlerdir...*

»»»»

# ...rgütlenmenin ...rel Boyutu

## ...ıtlenmekte direnmektir!.."

Örgütlenme alanında politik gücün etkinliğinin sağlanması da esasen sosyal ve kültürel alanda gerçekleştirilecek geniş örgütlenme ağıyla olanaklıdır...

*Bu türden örgütlenmeler de oluşturulmadan kitleler salt "ulusal baskıya" karşı savaşım sloganı altında ve yalnız politik örgütlenme içinde toparlanamazlar... Kaldı ki, kitlelerin gerek sınıfsal ve gerekse sosyal, örgütsel ve politik bilinçlerinin geliştirilmesinin bir yolu da ekonomik ve sosyal yapılarına denk örgütlenmelerin yaratılmasıdır...*
*Kitleleri direk bir politik örgüt bünyesine çekmek çoğu zaman zordur ama güncel, ivedi ve özlük sorunlarını programlaştıran örgütlere çekebilmek o denli zor değildir... Aksine kitle bu ivedi sorunlarını çözmede araç olabilecek örgütlenmeleri çoğu zaman kendisi bile kurabilmektedir... İçinde yaşadığı gerek üretim süreci, gerekse çalışma koşulları ve daha bir çok sosyal sorun onu kimi zaman kendiliğinden ve kaçınılmaz olarak bu türden sosyal ve kültürel örgütlenmelere yöneltmektedir...*
*Bu anlamda toplumun tüm kesimlerinin yapılarına uygun demokratik örgütlenmesi zaman yitirilmeden başlatılmalıdır...*
*Buna göre ; başta işçiler olmak üzere, topraksız köylüler ve genelde köylüler, memurlar, öğretmenler, akademisyenler, yazarlar, gazeteciler, çizerler ve genelde aydınlar, genelde sanatçılar, doktorlar ve genelde sağlık elemanları, avukatlar ve genelde hukukçular, mimar ve mühendisler ve genelde teknik elemanlar, esnaf ve sanatkarlar, öğrenciler ve genelde gençlik ve kadınlar yaygın bir şekilde örgütlendirilmelidirler... Bunun yanı sıra ; değişik toplum kesimlerinin harmonik yapısından oluşan doğa ve ekolojik sorunlar, insan hakları ve buna benzer istemler etrafında insanları biraraya getirebilecek örgütlenmeler de yaratılmalıdır... Bu türden örgütler aracılığıyla da yığınla insanı organize edebilmek olanaklıdır... Bu denli zemini ve yelpazesi geniş yaygın örgütlenmeler hiçbir zaman güç dağınıklığı anlamına gelmez... Aksine dağınıklığı gidermenin bir yolu da zaten kitleleri ürkütmeyen, güncel ve ivedi sorunlarıyla ilgilenen örgütlenmelerin yaratılmasıdır. İnsanları bir arada, birlikte örgütsel çalışmaya alıştırmak, özendirmek, örgütsel çalışma bilincini geliştirmek, bu konudaki ürkeklik ve endişelerini gidermek bakımından da olsa bu şekildeki örgütlenmeler son derece önemli ve kitlesel organizeleşmeyi yaratmada son derece başarılı birer kaldıraç işlevi görürler... Bu alt ama ivedi görevleri kapsayan örgütlenme ağı, kitleleri birden ve topluca dinamize etmede de önemli kolaylıklar sağlamaktadır... Aynı şekilde ortak sosyal ya da ulusal taleplerle ilgili savaşım sürecine de kitleleri bu araçları kullanarak katmak, harekete geçirmek daha olanaklı ve sağlıklı olabilmektedir...*
*Öte yandan bu tarzdaki demokratik örgütlenme, toplum içinde değişik güç odaklarının oluşmasına da yol açar ve monolitik örgütlenmenin sakıncalarını da önler ve toplum içinde demokraik ve plural örgütlenme zemini ni güçlendirir... Kitleler, katılımcılık ve çok seslilik içinde ve daha sağlıklı bir örgütlülük sürecine sokulabilir...*

### *Sosyal ve kültürel örgütlenmenin politik güç ile ilişkileri*

*Toplumu sosyal pratik içinde eğiterek ilerletme ve örgütlendirmeyi öne koyan politik gücün zaten sosyo-kültürel örgütlenme planının olması gerekir... Bir politik gücün, toplumu tüm gözeneklerine kadar örgütlendirebilecek bir örgütlenme projesi yoksa, savaşım anlayışı, devrim programı ve düşüncesiyle derin bir çelişkisi var demektir... Devrimi hedefleyen politik güç, iktidarı hedefliyor demektir... Iktidarı almayı planlayan politik gücün devrim sonrası kurumlaşmayı yaratacak sosyal ve kültürel organizeleşmeyi devrim süresince başlatması ve giderek kurumlaşmayı başarması gerekir... Aksi halde en başta devrim başarılamaz...*
*Politik gücün demokratik kitle örgütleriyle sıkı ve uyumlu ilişkisi sömürgeci rejime karşı savaşımın başarısının genel koşullarından biridir... Yaygın sosyo-kültürel örgütlenme savaşımın başarısı ve zafer için kaçınılmazdır...*
*Sosyo-kültürel örgütlenmeler direk iktidarı hedeflemeselerde, rejimin güçten düşürülmesi savaşımında temel bir işlev görürler ve politik gücün iktidarı almasını kolaylaştırırlar... Zaten rejim bir politik gücü tasfiye ederken en başta kitlelerin sosyal ve kültürel örgütlenmesini sıkı bir zapturapt içine alır ya da politik gücün yönetme ve yönlendirme fonksiyonunu*

»»»»

www.arsivakil.org

sıfırlamaya çalışır... Bu kuşkusuz politik güç ve sosyal-kültürel örgütler ilişkisinde önemli bir tehlikeyi oluşturur... Bir diğer tehlike de ; bizzat politik gücün fazlasıyla ileriye kayarak, en genelde emekçi ve köylü yığınlarının sosyal ve kültürel örgütlenmeleriyle bağlarını koruyamamasıdır...
Politik örgüt - kitle örgütleri ilişkilerinde, politik gücün pozitif ideolojk ve politik çalışmaları yönlendirici olur... Karşılıklı pozitif etkileşim savaşımın daha istikrarlı yol almasını sağlar... Bu ikilemde kitle örgütleri de rejime karşı tavır almak durumundadırlar... Ya emekçi halkın çıkarı doğrultusundaki politik savaşıma güç vermek ya da rejimle uyum aramak... Başka bir seçenek yoktur... Zaten sınıflı toplumlarda tarafsızlık en genelinde burjuvazinin sınıfsal konumunda yer almak anlamına geliyor... Kitle örgütlerinde üye sayısı genellikle geniş ve yüksektir... Bu nedenle söz konusu örgütler, politik güce kıyasla emekçi halk üzerinde daha büyük ve daha direkt etki gösterebilirler... Politik güç, kitle örgütlerinin etki ve gücünün artmasına yardım etmelidir... Çünkü bu karşılıklı bağları da güçlendirir.. Politik gücün etkisi ve insiyatifini de arttırır...
Politik güç ile kitle örgütleri arasında ortak çıkarlar vardır ve bu nedenle birbirlerine sürekli karşılıklı yardımda bulunurlar... Politik güç ile emekçi kitle örgütleri arasında büyük bir politik önem taşıyan temel örgütsel sorun, karşılıklı doğru ilişkilerin kurulması sorunudur... Bu ilişkiler gönüllü oluşturulabildiği ölçüde başarılı olunabilir... İktidarı ele geçirmede kitle örgütlerinin sağlıklı yönlendirilmesinin önemi büyüktür... Savaşımcı bir politik gücün büyük önem taşıyan örgütsel ilkelerinden biri, örgüt olarak geniş halk yığınları ile sıkı bağlar kurabilmesidir... Politik örgüt içine kapanarak, kendisini sınırlayarak, izole ederek etkinlik sağlayamaz... Halk yığınlarına geniş ölçüde dayandıkça onlardan güç kazanır ve bu çalışmalarıyla halk yığınlarına hizmet eder...
Tarihin gerçek yaratıcıları halk yığınları olduğuna göre, tüm halk kesimlerinin enine boyuna sosyal ve kültürel boyutta örgütlendirilerek savaşıma seferber edilmesi başarı ve zafer için zorunluluktur... Halk yığınları ya örgütlü ya da spontane hareket ederler... Halk yığınlarının spontane kalkışları ile ilgili örnekler kuşkusuz yok değil... Ancak bu kalkış ve savaşlar genellikle kalıcı başarılar yaratmazlar...

Ama örgütlü ve amaca yönelik hareket ettiklerinde büyük ve kalıcı başarılar elde edebilirler... Halk yığınlarını bu örgütlülük düzeyine çıkaranlar da, belirli sınıflar ve onların politik örgütleridir... Politik örgüt yığınlarla bağlarını gerçekleştirmede, emekçilerin çeşitli karakter taşıyan örgütlerine dayanır... Geniş halk yığınlarının bu örgütlerde birleşmesi, politik gücün bu örgütler üzerindeki etkisi, yığınların bilinç ve örgütlülüğünün yükseltilmesi çalışmalarına olanak verir...

**Kürdistan da sosyal ve kültürel örgütlenme**

Kürdistan devriminin geniş halk kesimlerine dayanması, onları kucaklaması, halkın güç ve enerjisini harekete geçirmesi de politik örgütlenmenin yanı sıra yaygın bir sosyal ve kültürel örgütlenme ağının kurulmasıyla olanaklıdır... Gerek politik zeminde olsun gerekse demokratik eksende olsun örgütlenme bir bütün olarak savaşımı yükseltmek ve başarıya, zafere götürmek ve iktidarı almak için kullanılan temel araçlardır... Bu araçların yer, zaman ve koşullara göre sağlıklı bir şekilde kullanılabilmesi bu alanda ulaşılan başarıyla yakından ilintilidir... Bugün Kürdistan da nicel gücü oldukça sınırlı ama sayıca yüksek politik örgütlenmeler var... Ama sosyal ve kültürel alanda örgütlenme oldukça geri hatta yok denilecek ölçüdedir... Oysa salt politik zeminde örgütlenme ile kitlelerin tüm kesimlerini sadece politik örgütlenme ağının içine çekebilmek güçtür... Ama daha önce de belirttiğimiz gibi çeşitli toplum kesimlerini gereksinimlerine göre biçimlenen örgütlenmelere sevkederek onları geniş bir yelpaze içinde örgütlü savaşım içine çekmek olanaklıdır... Bu alandaki örgütlenme her zaman politik örgütün yönetim ve insiyatifinde olmayabilir ama bu sosyal ve kültürel alandaki örgütlenmelerin önemini asla azaltmaz... Kaldı ki, politik alandaki örgütlenme gerçek boyutlarına oturtulmasa da sosyal ve kültürel alandaki örgütlenmenin gerçekleştirilmesi değişik toplum kesim ve gruplarının ivedi istem ve gereksinimlerini programlaştırmak bakımından zorunludur...
Buna göre ; Kürdistan da sosyo-kültürel alanda boşluğu ağır bir şekilde hissedilen örgütlenmenin sağlanması gerekir... Öncelikle bu alandaki bağımlılığa son verilmelidir... Bu alandaki örgütlenme gelecekte bağımsız Kürdistanın temel yönetim kurumlarının ilk temelini oluşturacaklardır... O nedenle bağımsız temelde örgütlenme bu alanda da sağlanmalıdır...

Bu aşamadan itibaren ; Kürdistan işçilerinin, memurlarının, öğretmenlerinin, akademisyenlerinin, mühendislerinin, hukukçularının, doktorlarının, kadınlarının, gençlik kesimlerinin, köylülerin, esnaf ve sanatkarların, gazeteci, yazar, şair, çizer ve sanatçılarının, kısaca çalışan tüm kesimlerin ayrı ve ülkesel düzeydeki sendikalarda, birliklerde, kooperatiflerde, derneklerde ve kurumlarda örgütlenmeleri gerekir...

Politik düzeyde sağlanan ayrı örgütlenme artık sosyal ve kültürel alanlarda da başarılmalıdır... Geleceğin bağımsız toplumunun, bağımsız kurum ve kuruluşlarının nüvelerinin şimdiden oluşturularak halkın bağımsızlık bilincinin geliştirilip güçlendirilmesi gerekir... Kürdistan toplumu politik ve demokratik tüm kurum ve kuruluşlarıyla bağımsız olarak örgütlendirilmelidir...
Kürdistan'ın tüm çalışan kesimlerinin ve meslek gruplarının ayrı ve bağımsız örgütlerinin oluşturulması

»»»»

*görevi en az politik alandaki örgütlenme boşluğunun doldurulması görevi kadar ivediliğini ve önemini koruyor...*
*Bu alanda kurulacak ilk bağımsız ve ülkesel sendika, kooperatif, birlik, kurum ve dernekler Kuzey Kürdistan devriminin örgütlenme sürecine önemli bir ivme ve dinamizm kazandırdığı gibi savaşımın kitlesel boyutunu da arttıtacak ve kitlelerin savaşım alanına çekilmesini kolaylaştıracak, savaşım moralini yükseltecek aynı şekilde sömürgeci rejime karşı ciddi bir örgütlenme ve moral üstünlük de sağlanmış olacaktır... Böylelikle sömürgeci rejime karşı muhalefetin boyutları genişleyecek ve ulusal düzeyde tüm halk kesimlerine dayandırılacaktır...*
*Örgütlenme alanında politik gücün etkinliğinin sağlanması da esasen sosyal ve kültürel alanda gerçekleştirilecek geniş örgütlenme ağıyla olanaklıdır...*
*Politik örgütlenme sürecinin dayattığı görevleri aksatmadan, geriletmeden sosyal ve kültürel alandaki örgütlenmeye de başlanmalı ve hızlandırılmalıdır...*
*Görev artık ; ülke düzeyinde sendikalarımızı, koopratiflerimizi, birlik, kurum ve derneklerimizi ülke adını kullanarak gerçekleştirmektir...*
*Kürdistan halkı ; tüm sosyo-politik ve sosyo-kültürel kurum ve organlarını ülkesel düzeyde ve çapta ve bağımsızlık temelinde oluşturma ve kurma hakkına sahiptir... Bu doğrultuya yönelirken ; sömürgeci rejimin baskıları bir yana, egemen ulusun sol çevrelerinden gelecek "eleştiriler", çıkarılacak pratik engeller, "teorik" yozluklar gibi özünde "misak-ı milli" ci tavır ve politikaların artık hiçbir "değeri" yoktur ve olmayacaktır!... Kürdistan'ın bağımsızlık savaşımı her alanda ve düzeyde ayrı kurumlaşmayı gerektiriyor. Çünkü Kürdistan halkı, ayrı ve bağımsız devletini kurma yolundadır...*
*Bu görevin üstesinden gelmek elbette zor olacaktır. Ama zaten en büyük zorluk bağımsızlık savaşımını örgütlemek ve sürdürmektir... Ve bu zorluklar da önümüzde duran görevlerdir...*

*Kürdistan devrim süreci, sömürgeci rejimin acımasız baskıları altında yol alıyor. Yaşamsal önem taşıyan örgütlenme çalışmaları politik düzeyde hangi koşullarda sürdürülüyorsa, sosyal ve kültürel boyutta da aynı hal ve şartlarda başlatılmalı ve hızlandırılmalıdır... Direnmek yaşamaksa, örgütlenmekte direnmektir!..*

**17 Mart 1988**

**HALEPÇE'Yİ UNUTMA!**

# Boyalı Türk Basını ve Kaderimiz!..

**Westan XEŞE / Berlin**

**Kendi kaderimizi kendimiz tayin edeceğiz**

Boyalı basının kocamış yazarları 1980'lerden önce Kürt kelimesini bile ağızlarına almaktan korkarken, Türkiye'de yaşayan herkes Türktür diyen, gazete baş köşelerine ve çay bardaklarına kadar "Türkiye Türklerindir" yazan ağızlar bugün Türkiye de Kürt varlığından sözetmeğe başladılar. Hayırdır inşallah! Biri dillerini serbest bırakalım derken diğeri "şarkılarını özgürce söylesinler" diyerek nerdeyse "kaderimizi tayin"e çabalıyorlar! Hem de bu kadar yoğun işleri arasında! Zavallı beyler sadaka mı dağıtıyorsunuz. Buna ihtiyacımız mı var zannediyorsunuz. Ünlü deyişle ; "Gölge etmeyin başka ihsan istemiyoruz"!..
Halkımız yeteri kadar bilinçlenmiştir. Birgün korkunuz başınıza gelecektir. Zaten halkımız neyi alıp almayacağına kendisi karar vermiştir, şüpheniz olmasın!..

Boyalı basının kocamış yazarlarından Hikmet Bil, Hürriyet gazetesindeki "Kıbrıs sorunu ve Doğudaki Kürtler" başlıklı köşe yazısında bakın neler söylüyor :

*"Kürtler Türkiye'de asla bir azınlık değildirler... Çünkü onlar önce bizim gibi müslümandırlar sonra da asırlar boyunca hep birarada kaynaştığımız için tıpkı Lazlar gibi, Çerkezler gibi Tatarlar gibi Türk ulusal birliğinin artık bir parçası olmuşlardır. Kurtuluş savaşımızda kanlarını dökmüş canlarını vermişlerdir. Aralarında hala kendi dillerini konuşuyorlarsa bunun yadırganacak hiçbir yanı yoktur. Çünkü Lazlar da Lazca, Çerkezler de Çerkezce konuşuyorlar işte. Önemli olan bizim vatandaşlarımız arasında hiçbir fark gözetmemiş olmamızdır..."*

Bu yazısıyla Hikmet Bil aslında bay Hikmet Bilmez olduğunu bir güzel ele veriyor. Bay Hikmet Bilmez birkez ; "Türkiye Kürdistanı"nda nüfusu yaklaşık 13 milyon olan kürtler azınlık değiller. Ortadoğu da ise yaklaşık 25 milyon nüfusuyla kürtleri azınlık saymak için hem cahil hem de gafil olmak gerekir. Ve zaten siz bay Hikmet Bil ve sizin gibileri hem gafil hem de halkımızın düşmanısınız... Ulusumuz yıllardan beridir ki etkin bir ulusal kurtuluş savaşımı başlatmış ve

Devamı sayfa 19 da

GADANI ... Pêşî di rûpela 9 -a da

ku wê demê hewcetî bi "sernermîyê" hebûye! Ji ber ku li Kurdistanê kesê ew nasnedikir... Li mitînga pêşî ya partîyê min ew da naskirin ku ew Qasimlo ye û sekreterê partîyê ye... Herweha ji bo kesên ronakbîr jî min ew da naskirin ku mirovekî nasyar, zana û kêrhatî ye... Digel çu rêxistinên Iranî jî peywendîyên wî nebûn... Çawa hate Tehran'ê, ez wek berpirsîyarê rêxistina partîyê ya Tehran'ê digel gerîyam û min ew bi wan rêxistinên Iranî da naskirin ku ew Qasimlo ye...

.....

**** *Anku hemû imkanatîyên partîyê yên malî û leşkerî di destê xwe da girtibûn...*

**GADANI** - Belê. Her tişt di destê xwe da kom kiribû ku di dinyayê da tişê wisa kêm tête dîtin... Gelek cara, du-sê car, me jê pirsîye ku partîyê çi heye, çi nîne... Her di kongra 7. da serokhêzek bi navê Ehmed Destanî ji Qasimlo pirsî û got : "Kak Doktor, niha wext hatîye ku em bizanin ka partîyê çi heye, çi nîne..."
Qasimlo li ser vê pirsê hêrs bû û got : "Heta ez sekreter bim, nabe ku kes bizane..." Li kongra 6. da jî her ew pirs hatîye halê. Herweha di çend plenumên partîyê da ev pirse bûye behs... Lê belê her digot : "Kaka, pêvîst nîne hûn bizanin... Heke we bawerî bi min nîne, min biguhurin, na we bawerî hebe ji xwe her tişti qebûl bikin..." U herweha digot : "Wesîyetnama min li nik Partîya Sosyalîst a Frense ye..."
Wexta vê carê ez hatim Frense, min ji Partîya Sosyalîst a Frense pirsî ku wesîyetnama Qasimlo li nik hewe ye... U em bi navê PDK-I / Rêberîya Şoreşger dixwazin vê wesîyetnamê bizanin... Gotin : "Qet tiştekî wisa nîne, derew e... Bo çi em wesîyetnama wî li nik xwe ragirin..."

**** *Tiştekî seyr e... Dîktetorîyeke kesînî danîye li nav partîyê... Ev nexweşîye li nav hindek hêzên Kurdistana Bakûr jî heye....*

**GADANI** - Mixabin, lê belê wisa ye... Berê digotin ku Barzani dîktetor e... Lê belê bi bawerîya min Barzanî jî wekî wî nebûye...

.........

**** *Kak Celîl, peywendîya digel Iraq'ê jî herhal wî tenê bi şexsê xwe ve girêda bû...*

GADANI - Ew berpirsiyarê peywendîyên derve bû... Anku hemû kontakên derve, digel Iraq û yên dî her di destê wî da bûn...
Ji bo vê yekê ew anku fraksîyon ji me bi awantajtir bûn... Gerçî me niha dest bi peywendî danîna kirîye... Lê belê wan niha ev imkan jî nîne... Ji ber ku kes ji wan, ji kontakên derve agahdar nîne... Gelek peywendî hebûn, lê belê heta ew nehata kesê nedikarî di rê bibin... Wexta ez li sala 1984-ê li derve bûm, hindek peywendî min bi xwe danîn digel sefaretên dewletên sosyalîst û hind cigehên dî... Min rapora ev peywendî û hevdîtinên xwe da PB'yê ku hêj niha jî di destê me da ye... Lê belê Qasimlo 6-7 meha sefer dikir û çu cara raporek raberî organên partîyê nedikir... Tiştê bixwesta digot, yên nexwesta nedigot... Piştî ev hinde pirsan êdî imkana pêk ve xebata digel wan nemabû... Heke me dom bikira, hingê dibû xîyanet beramberî xelkê me û eve derseke mezin e bo hemû hêzên Kurdistan ku rê nedine dîktetorîyê ku cih bigre... Çiku zerareke mezin me jê girt...

**** *Ew biryara "sosyalîzma demokratîk" ya di kongra 7. da hatîye wergirtin, me bihîst ku ev biryare adeta bi zora Qasimlo hatîye wergirtin...*

**GADANI** - Ev biryare di pêş da bi dengên piranî hate red kirin... Paşê Qasimlo sil bû, tûre bû û ji salona kongrê derket û got ku ez namînim, kar nakim... Kongre tehdît kir... Paşê pirs dîsa hate "mûzakerekirin"... Hindek kesên ku cara pêşîn dijî pêşnîyara Qasimlo bûn, dengên xwe guhartin... Yêk ji wan jî Hesen Şerefî bû ku niha endamê PB'ya wan e... Wekî Hesen Şerefî destê xwe wek dijdar rakir, Qasimlo got ; "kak Hesen, tu jî dijdarî...". Şerefî go ; "Na, kak Doktor, ez denga dihejmêrim..."!...

**** *Qasimlo bi raman û îdeolojîya xwe ve kadroyekî Enternasyonala Sosyalîst bû... Dixwest vê ramanê hakimî partîyê bike...*

**GADANI** - Belê... Rastîyek ewe ku hindek kesên dî ev role hilgirtîye ser xwe ku Dr. Qasimlo li ser serê wan bû, dixwest sîyaseta wan berepêş bibe... Heke sîyaseta wan qazanca kurda ye û tiştekê didin kurda, em tiştek nabêjin... Lê belê heke dixwazin kurd bibin xûlam û nokerên wan û di emrê wan da bin û bi qazanca xwe kar bînin digel Iran, Iraq û Tirkîyê, hingê eve karê şoreşgerî nîne...

........

**** *Kak Celîl, piştî kongra 8. hûn jî cûda bûn û we biryar da ku hûn jî bi navê PDK-I / RŞ karê xwe yê sîyasî bi rêxistinî bidomînin. Rewşa we çawa ye?..*

**GADANI** - Rewşa me baş e... Her wê roja ku em cûda bûn û me daxûyanîya xwe belav kir, hejmareke bilind ya endam, kadir û pêşmergên partîyê hatin tevî me bûn, hevkarîya xwe digel me dîyar kirin... Me xwe hem ji alîyê sîyasî û rêxistinî ve hem jî ji alîyê leşkerî ve zû rêk û pêk kir... Eve du sale, gelek micid em karê xwe berdewam dikin... Sala pêşî ji ber ku em xerîkî konferansê bûn, karê me kêm bû. Lê belê xebat û têkoşîna ev sale pêşvetir bû...

........

**** *Peywendîya we digel Micahidîn çawa ye?..*

**GADANI** - Her wekî hêzên dî yên Iranî digel wan jî peywendîya me heye... Her di serî da ku em dest vala bûn, me daxwaza hevkarîyê ji wan hemû hêzên Iranî kir... Her

»»»»

niha jî em bi hevkarîya xelkê xwe û hêzên Iranî karê xwe didomînin... Dewleta Iraqê heta niha jî hevkarîya me nekirîye... Ji alîyê malî ve jî qet hevkarîya me nake...

**** *Ji alîyê leşkerî ve...*

**GADANI** - Belê, her ji alîyê leşkerî ve jî... Ji ber vê yekê, me bawerî bi peywendîya digel hemû hêzan heye... Ev yeke bo me prensîbeke...

........

**** *Şîara "Demokrasî bo Iran û Otonomî bo Kurdistan" her berdewam e?...*

**GADANI** - Ev şîare di partîya me da her berdewam e... Di konferansa 4. da jî hatîye teyîd kirin... Lê belê pirsa mafê çarenûsî jî em qebûl dikin... Di nav partîya me da jî riberiza vê pirsê heye...
Di pêşî da kongre an jî konferansek pêk bê, dikare vê ramanê biguhure... Hingê em jî dê tabiê raya giştî bin... Lê belê, îro şîara me her wekî berê "Demokrasî bo Iran û Otonomî bo Kurdistan" e...

**** *Kak Celîl, reftara partîya Qasimlo'yan dîyare digel we ne baş e...*

**GADANI** - Mixabin, ji roja pêşî heta îro ewan neku dostayetî, lê her dijayetî û dijminatî digel me kirîye... Tohmet û ithamên neqenc li me kirine û niha jî dikin... Ji bilî vê yekê, gelek hevalên me girtin û şehît kirin... Rê li pêşmergên me girtine, çek jê standine... Lê belê pêşmergên me her gotine wan ku em şerê birakujî nakin û çekên xwe dayne...
U heta niha jî gelek şerên dijwar digel me kirine... Heta niha 7 hevalên me şehît kirine... 2 ji wan her îdam kirin, 5 jî xistin kemînê û kuştin... Her wan êrişî me kirîye, rê birîne... Lê belê, me tenê xwe parastîye...

**** *Anku hûn mecbûrî şerê xwe parastinê kirîne...*

**GADANI** - Belê. Hem me xwe parastîye, hem jî em mecbûr kirine ku bersiva êrişên wan bidin... Heqekî meşrû ye ku heke êriş bê ser mirov, divê mirov xwe biparêze, bo parastina xwe şer bike... Gerçî em dijî şerê navînî ne... Vî şerî em bi qazanca dijmin dizanin... Me ji hemû hêz û kesên welatparêz daxwaz kirîye ku vî şerê birakujî rawestînin, rê lê bigrin, mehkum bikin ku qazanca rejima Islamî di vî şerî da heye... Xizmeta gelê kurd tê da nîne...

**** *Peywendîya we digel Komelê çawa ye...*

**GADANI** - Peywendîya me digel Komelê baş e, dostayetîya me baş e...

**** *Şer nîne...*

**GADANI** - Nexêr şer nîne... Her di daxûyanîya cûdabûnê da me eşkere kir ku em şer digel Komelê nakin û şerê birakujî mehkum dikin...
Iro jî şerekî wisa em wek şerekî neheq dizanin... Divê ev şere bête rawestandin... Me yêkalî ev biryar daye... Komelê jî ev biryare qebul kirîye... Me herweha biryar da ku digel Fraksîyonê jî şer nakin, lê belê ew her şerê xwe dijî me didomînin... Bersiveke pozîtîf nadin...

**** *Radyoya we jî heye...*

**GADANI** - Belê, radyoya me heye... U di rojê da sê cara û her carekê jî saetekê program heye... Hem kurmancî - soranî, hem jî farisî...
Heftîyê carekê programa edebîyat û hûnerî jî heye... Programek dî jî heye ku deng û behsên ji rojnamên cîhanê kom dikin û belav dikin... Programek jî bi navê "Awêneyî Rasteqîne" heye ku di vê programê da bîranînên pêşmerge tête xwendin... Wekî dî jî helbet deng û behs, tefsîr û propaganda partîyê û hêza pêşmerge têtê kirin...

**** *Kak Celîl, qet herêmên azadkirî hene di destê pêşmerge da...*

**GADANI** - Niha di Kurdistana Iranê da çu herêmên rizgarkirî nînin...

**** *Bi awayê partîzanî şer têtê kirin...*

**GADANI** - Belê... Em, Komele û Fraksîyon bi awayê partîzanî şer dikin... Karê partîzanî dom dike û serketî ye... Karê sîyasî jî herweha bi dizî têtê kirin... Di nav axa me da binkên leşkerî me nînin... Li ser sînor dimînin... Di nav herêmên çol kirî yên Kurdistana Iraqê da dimînin... Li nav dol, newal, şax û zozanan da... Helbet jîyaneke bi zor û zehmetî ye... Lê belê pêşmergetî wisa ye... Jin û zarokên me jî ev adetê jîyanê girtine... Di her merc da kar û têkoşîn dê dom bike... Her niha wekî digel te daxivim jî pêşmergên me diçine nav welat û xebat û têkoşînê didomînin...

**** *Kak Celîl, peywendîya we digel hêzên Kurdistana Iraqê çawa ye...*

**GADANI** - Em hewil didin û herweha biryara me jî heye ku em digel hemû hêzên Kurdistanî li çaralî kontakê daynin... Ji ber ku di rewşa Kurdistana Iraq da em digel hêzên Kurdistana Iraq zortir têkilav bûne... Kampên wan li Kurdistana Iran in... Kampên me jî li Kurdistana Iraq in... Peywendîyên me digel hev hene û eve tiştekî tebiî ye... Biryara me heye ku li ser bingeha biratî û dostî û rêzdarîyê hevkarîya hevûdu bikin...

**** *Hat û çûn heye...*

**GADANI** - Ji ber ku sînor gelek hatine şidandin, hatin çûn gelek zehmet e... Lê belê dîsa dibe..

**** *Qet nebe hewayekî dostayetî heye di navbera we û wan da...*

»»»»

GADANI - Belê heye... Ji xwe me qet ahengekî dijminatî digel çu kurdekî bi şeref û xebatkar nîne û nabe jî...

......

**** *Kak Celîl, Îro li rojhilata navîn rewşa Kurdistan bi giştî baş xûya nake... Hem ji alîyê sîyasî hem jî ji alîyê leşkerî ve... Hêz gelek ji hev belav in... Herweha di saha dîplomasîyê da jî gelek kêm û kasîyên me hene... U herweha ji bilî welatên sosyalîst gelek alî û hêzên navnetewî wekî Enternasyonala Sosyalîst, Amerîka Yêkbûyî û yên dî dixwazin bi pirsa me ve mijûl bin... Li ser van, bîr û bawerîya we û partîya we çi ye?...*

GADANI - Divê em di serî da Işareta wê xeterê bikin ku ew dewletên Kurdistan dagîrkirine dijî bizava gelê me ya îro di navbera xwe da hevkarîyê daynin...
Ji ber vê yekê divê kurd îro ji her demî zêdetir li ser hev agahdar bin, hayê wan ji hev hebe... Zêdetir digel hev peywendî daynin... Heta ji berê zêdetir hev bigrin... Ev yêkitîye û hevgirtine heke li alîyê leşkerî ve tesîr neke jî li alîyê sîyasî ve li cîhanê hetmen tesîrek, nîşan dide... Gerçî ji alîyê leşkerî ve rewş ne baş e, ji ber ku herêmên rizgarkirî nemane... Lê belê xebat dom dike... Divê em girîngîyê bidine du tiştan :
1. Rêz kirina xelk, anku pirsa rêxistinî ya di nav gel... Ku ev erkekî gelek grîng e bo hemû hêzên Kurdistan...
2. Peywendîyên me digel hev xurt bin... Hayê me ji hev hebe... Ji hev xafil nebin... U bigihin bawerîyekê ku pirsê wek pirsa kurd bînine pêş... Çiku ev ramane niha li zemînê cîhanê da jî li pêş e... Hingavek heye... Wekî we gotî, hindek alî hene ku bi pirsa me ve mijûl dibin... Helbet ew ji bo mesleheta xwe vê dikin... Lê belê, divê em jî ji vê hingavê istifade bikin... U kelk jê werbigirin... U nehêlin ku ev pêla bo sûda kurda hatîye pêş, bisekine... Divê zêdetir bikin... Zêdetir kirin jî tenê bi hevkarî û hevgirtin û hevdengîya hemû hêz û rêxistinên kurd dibe û divê digel kurdên li derveyî welat jî peywendîyeke xurt bête danîn ku zêdetir propaganda pirsa kurda bête kirin... Digel şexsîyet, hêz û rêxistinên sîyasî yên Ewrupî û Amerîkayî jî zêdetir peywendî bête danîn, heta ku heqîya pirsa kurda zêdetir bête pêş... Divê em zêdetir zorê bidine propagandê ku pirsa xwe rontir bikin bo hemû gelên cîhanê... Divê di vê pirsê da em hemû yekdeng bin... Xebat û propaganda neku tenê li Ewrupa, divê heta Afrîka jî bête kirin... Niha Afrîka me nasnake, nazane... Divê em pirsa xwe bibine wê derê jî...
Li Amerîka Yêkbûyî pirsa me kêm hatîye pêş... Divê em zêdetir ber bi pêş bibin... Neku tenê bo dewleta Amerîka, herweha bo xelkê Amerîkayê jî... Ku heke senatorekî Amerîkayî li ser pirsa me axift daku bo gelê Amerîka pirsa kurda xerîb nehêtin...

Di vê yekê da jî, kurdên me yên li derveyî welat divê xebateke bê westan bikin... Ronakbîr û karkerên kurd li derveyî welat erkekî grîng heye ku dê tesîra wan jî hebe... Hêvîdarim ku ronakbîrên kurd vî erkê xwe bi cih bînin... Ku pêşmerge û kadirên sîyasî yên ku îro li welat têdikoşin, hêvîya wan jî ev e...

**** *Kak Celîl, ji bo pêkanîna kongreyeke netewî an jî mecliseke netewî li seranserî Kurdistan ku bibe otorîte li cîhanê bo pirsa kurda, hûn çi dibêjin?...*

GADANI - Helbet eve karekî hêsan nîne... Têkoşîneke bêwestan, hevbîrî û wext divê... Lê belê heke hêzên Kurdistan ji bo pirseke wisa grîng bigihin hev, hingê tesîreke herî mezin dê bibe li hemû cîhanê û ji xwe bo hella pirsa kurd jî şertek ji şerta ev e...

.........

**** *Kak Celîl, Qasimlo di "mûzakera" digel rejima Iranê da hat kuştin... Li ser vê çendê çi dibêjin...*

GADANI - Dîyare ku me di daxûyanîya xwe da jî kivş kir ku ev kuştine necamêrane ye... Ev terore me mahkum kir.. Heta me ji dewleta Avusturia xwest ku lêkolîneke micid li ser vê terorê bike... Wexta ez çûme Avusturia, hevdîtineke min çêbû digel cihgirê wezîrê derveyî welat yê Avusturîayê... Di wê axiftinê da jî min gotê ku vê bûyerê sist negirin...
Me raste rast gote wan ku em wekî kurd xwûngirên Qasimlo ne... Ku ew jî gihiştine wê bawerîyê ku Iranîya ev kare kirîye û xerikê dadgahê ne... Hindî ku "mûzakere"ye!.. Di vê rewşê da ya rastî em "mûzakerê" tiştekî xewn û xeyalî dizanin... Bi bawerîya me ewe ku hûkmeta Iranê zor û stema xwe zêdetir kirîye... Di Kurdistanê da berê 200 hezar ertêş hebû... Lê belê niha ev hejmare bûye 250 hezar... Ji ber ku ew ertêşa di demê şerê digel Iraqê da li Iraqê bûy paşî paşekişê hatin li Kurdistanê bi cih bûn... Helbet ev qas hejmareke bilind ya ertêşê dîyare bo serkut kirina gelê kurd li Kurdistanê ye... Bi hezaran girtîyên sîyasî li zîndana hatine şehît kirin... Li Kurdistanê jî ev kare tête kirin... Piştî şerrawesta digel Iraq, bi sedan kes li Kurdistanê hatin îdam kirin... Niha lîsteyeke piçûk di destê me da heye ku navê 72 kesan tê da ye... Ev lîste ya yên îdam kirî û yên hatine kuştin e... Helbet hejmara kuştîya ji vê gelek zêdetir e, lê belê eve her lîsteke piçûk e... 135 bajarên piçûk û gund hatine wêran kirin... Piştî şerrawestê li herêma Bane, Mahabad û Urmîye ev wêranîye hatîye kirin... Dîsa hejmara cigehên wêrankirî ji hejmara vê lîsta piçûk zêdetir e... Lê belê tenê ev çende me bi dest xistin...
Em xerîk in hêj agahdarîya bi dest bêxin... Xelkê wan bajêr û gunda jî, piranîya wan revîne Iraqê an jî çûne nav bajêrên dî yên Iranê... Ev tişt baş dide xûya kirin ku rejima Komara Islamî neku ber bi başîyê ve çûye, her bo her ber bi xirabîyê ve çûye...

Hindek dibêjin ku rejim ber bi lîberalîzmê ve diçe... Lê em di wê bawerîyê da nînin... Rejim zêdetir ber bi kevneperestî û dîktetorîyetê ve diçe... Ev rejime nikare qet pirsgirêkeke krîza sîyasî, aborî û civakî jî çareser bike... Her nake jî... Herweha pirsa Kurdistanê ji nikare çareser bike... Li alîyê dî, qet rûmeta vê rejimê jî nemaye li timamî cîhanê... Dinya hemû Iranê wek dewleteke terorist

»»»»

dizane... Ji xwe li seranserî İran terora dewletê di dereca herî bilind da ye.. Li Kurdistanê jî rejim dubare zulmê dike... Hem ji alîyê kurdbûnî, hem jî ji alîyê sunnî bûnê Kurdistan dubare li bin fişar û tedayê da ye... Şîara me ; "Demokrasî bo İran, Otonomî bo Kurdistan" e... Lê belê, ev rejime neku tenê otonomîyê nade Kurdistanê, herweha ew mafê azadî û demokrasîyê nade xelkê Kum, İsfahan û Meşhedê jî... Ku ev dere merkezên grîng yên Şiîyetê ne... Çiku wan bîr û bawerî bi mafê mirovî nîne, bi demokrasîyê nîne... Dijî sunnîyetê jî ne, çiku dibêjin ku em hûkmeteke Şiî ne...

******** *Kak Celîl, di vê niqtê da dîyare ku hûn qet hazir nînin ku peywendî daynin digel rejima İranê...*

**GADANI** - Ji ber ku mahîyeta rejimê wisa ye ku wekî me behs kirî, ew qet nikare mafê azadî û demokrasîyê bide gelên İranê û bi taybetî Kurdistanê... Eve deh sale ku di navbera me û wan da xwûn dirije... Ji ber vê yekê, her gotûbêj û rûniştin û hevdîtina digel vê rejimê, hukmetê, dewletê em bi tiştekî xirab dizanin...
Bi bawerîya me peywendî digel wan, bîr û bawerîya xelkê me ya şoreşgerî zeyîf dike û heqanîyet û meşrûîyeta vê hukmetê dide teyîd kirin... Ji ber ku ev hukmete, hukmeteke kevneperest e, bawerî qet bi awayekî mirovî, ehlaqî û demokrasîyê nîne, ji ber vê yekê li gor bawerîya me peywendî digel rejimê ne rast e û em pêvîst jî nazanin... Digel rejimeke weha... Madem kî, mahîyeta vê rejimê wisa ye... Bîr û bawerîya wê wisa ye û wisa dirame... Herweha em kurd li hemû esmanê İran qet ronahîyeke demokrasîyê nabînin di demê vê rejimê da... Bo vê yekê rûniştin û hevdîtina digel vê hukmetê em xelet dibînin... Gotûbêja digel rejimê karekî xireb e...
Ji ber vê yekê peywendîya Qasimlo'ya em şaş û xelet dibînin û niha jî her piştî kuştina Qasimlo jî peywendîya wan dewam dike, rûniştine, axiftine digel rejimê ku em pê agahdar in... Tiştekî xirab dikin û hem kulaveke li serê xwe didin û hem jî li serê xelk dadinin... U em hêvîdarin ku herçend ew dijî me şer jî dikin, lê belê em wek kurd naxwazin ew bi destê rejima İslamî bêne kuştin... Hêvîdar im ku firûyê rejima İslamî nexwin... U dawî bi gotûbêja digel rejimê bînin... Digel xeletîyên xwe, runiştin bi rejmê ra axiftin... Rejimê jî di "mûzakerê" da Qasimlo kuşt... Ji ber van hemû sebeba peywendî, gotûbêj û runiştin digel vê rejimê divê neyên kirin... Hemû hêzên Kurdistan digel hêzên İranî divê opozîsyoneke pahn û berîn pêkbînin û dewamî têkoşîna xwe bikin ku heta vê rejimê bihilweşînin... U hukmeteke demokratîk û plûralîst li cihê wê damezrînin...

******** ***Piştî kuştina Qasimlo, rojnama Kurdistan Press digel endamê PB ya wan Hesen Şerefî gotûbêjek kir. Şerefî dibêje ku agahîya PB bi hevdîtina Wien nebûye... Eve tête çi manê!..***

**GADANI** - Eve tiştekî tebiî ye bi bawerîya min... Çiku gelek tiştê wiha bûyne... Li van deh salên dawî da ku em jî hingê wek endamê PB bûn, agahîya me bi gelek pirsan nedibû... Wekî em ketine nav enîya digel Micahidîn, piştî hate imza kirin heftîyekê me pê zanî ku em ketine nav enîyê... Neku tenê Hesen Şerefî dibêje, her wekî Mela Ebdula Heyakî hatî beşdarî merasima cenazê Qasimlo bûy li Paris'ê, wî jî gotîye ku agahîya PB'yê bi vê mûzakera dawî nebûye... PB'ya wan bi giştî li pirsa peywendîya digel rejimê agahdar in, ji ber ku biryara wan e.. Lê belê rast e ku agahîya wan nebûye ji wê hevdîtina dawîyê... Ev ne karê yekemîn yê Qasimlo bûye ku bêyî agahîya PB kar dike... Ev hemû nîşan didin ku di Fraksîyona wan da çend tekrevî û dîktetorîyet hebûye... Em hêvîdar in ku ew rexnên me dijî dîktetorîyet û dijdemokratîyetê kirî, li pêşçav bigrin... Ku bizanin ramana dîktetorîyetî çu cara nikare pêşda biçe... Serkevtî nabe... Divê awayê demokratîkî bi kar bînin li nav fraksîyona xwe jî...

******** *Piştî kuştina Qasimlo ihtimala yêkitîya we û wan çi ye?*

**GADANI** - Piştî kuştina Qasimlo, gelek dost û hevalan doz kirin ku em û ew dîsa bibine yêk... Me jî got ; em ne dijî yekgirtinê ne. Lê belê, em li ser tıştên şexsî ji wan cûda nebûn, li ser pirsên ramanî û sîyasî cûda bûne... Heke pirsên prensîbî bêne halê, hingê em hazirin rûnin û pirsa yêkgirtinê baxivin... Lê belê îro di navbera me û wan da şer heye... Ya rastî êrişên wan her berdewam in... Heta niha 7 hevalên me kuştin...
Em şer nakin, heke em jî bikin ew bi şev û roj dê şer bikin... Şerê propagandeyî û çekdarî dikin... Şer bête sekinandin, bêjin ku ev şere xirab e, mehkum bikin û bêjin em şer nakin, hingê em'ê rûnine ser masê û riberiza pirsgirêkên xwe bikin... Heke em gihiştine hev, pêk ve kar dikin, negihiştin hev jî, hingê ew wek partîyeke cûda em jî wek partîyeke cûda kar û xebata xwe bidomînin... Ji xwe di mercên îro da gelek zerûrî ye ku hemû hêzên Kurdistan hev bigrin û ev yeke erkeke dîrokî ye... Çi kesek dijî vê pirsa yêkgirtinê raweste, hingê di dîrokê da li pêş gelê xwe berpirs e û divê bersiva xwe bide...

******** *Piştî Qasimlo hat kuştin, Dr. Seit bû sekreterê PDK-I... Bîr û bawerîya Dr. Seit çawan e... Gelo dikare cihê Qasimlo tijî bike û herweha dikare yêkitîya partîyê biparêze... Ji ber ku herçend kêmasî, şaşî û xeletîyên Qasimlo hebûn jî, mirovekî zana, nasyar û xwûdan tecrûbe bû...*

**GADANI** - Wexta em ji Fraksîyonê cûda bûn, me got Fraksîyona Dr. Seit Şerefqendî û Qasimlo... Anku, herçend Qasimlo sekreter jî bû me navê Dr. Seit anî pêş... Bi bawerîya me her çi karê xirab û nebaş li nav partîyê dihate kirin, ji bin serê Dr. Seit derdiket... Dr. Seit ne mirovekî bi exlaq e, ne mirovekî xweşgo ye, ne mirovekî têkoşer e û kevne jîyana wî jî ne paqij e û dîsa ne kurdperwerekî sadiq e... Şertên îro wisa hatine pêş ku ew bûye sekreter... Tenê em daxwaz dikin ku ew di bîr û bawerîya xwe da, di pratîka xwe da, her di serî da ji bo pêşeroja xwe, xwe ji nû ve ji pêşçav derbaz bike... Heke vê bike, dibe ku hingê karê berpirsîyarîyê qederekê

»»»»

bidomîne... Na, heke wek berê bimîne, ji ber ku mirovekî dîktetor e, tekrev û bê bîr û bawerî ye, nikare berpirsîyarîyeke wisa giran li ser milên xwe ragire...
Gelek zehmet e ku cihê Dr. Qasimlo jî bigre... Ji ber ku Qasimlo jîyaneke bi tecrûbe û dirêj ya sîyasî hebû... Digel Tudeh'ê kar kirîye, di nav PDK-I da xebitîye û ev 10-15 sal bû ku sekreter bû... Li timamî cîhanê nasyar bû... Ji ber vê yekê cihgirtina wî piçek zehmet e... Lê belê, wekî me gotî Dr. Seit xwe li ber çav derbaz bike, xwe nû bike belkî hingê bikare demekê berpirsîyarîyê bike... Lê heke wek xwe û berê bimîne, nikare vî karî bidomîne...

******* Kak Celîl, her çend hûn niha li Iraq in û dewleta Iraqê qet hevkarîya we jî nake... Lê belê, hukmeta Iraqê gelek ezîyet û tedayê li kurdê Iraqê dike, gelek navçên Kurdistanê çol kirine... Qetlîama Helepçe li bîra we ye.. Li ser van pirs û bûyera hûn kiryarên hukmeta Iraqê dikarin eşkere mehkum bikin...***

**GADANI** - Her piştî qetlîama Helepçe, hevalên me li Ewrupa belavokek belav kirin û ev kiryare mehkum kirin... Ev kiryare, kiryareke nemirovane bû ku li timamî dinyayê deng veda û hate mehkum kirin... Her hukmeta Iraqê jî vê yekê qebul dike... Neku tenê dewleta Iraqê, her kî û çi dewlet, li kî derê kiryareke dijî mirovî bike, divê bête mehkum kirin... Heke em wekî kurd, kiryarên wisa mehkum nekin, her raste rast ne bêjine wan ku ev karê we karekî xirab e, dijî mirovî ye, hingê em nikarin parêzerîya mafên xwe bikin...

******* Anku peywendîyên digel dewleta divê ne bine manîê gotinên heq, rast û pêvîstî...***

**GADANI** - Belê... Bi bawerîya me jî divê wisa be... Her çi peywendî digel dewletek an jî hêzek, divê bi qeyd û şert nebin û li beramber kiryarên neqenc, nebe sebebê sistîyê û bêdengîyê... Bi taybetî bo kurda... Divê peywendîyên me yên digel dewletên ku kurd lê bindest in, divê zerara kurda tê da nebe li her cihekê... Heke di peywendîyên me da zerara kurda tê da be hingê ne tenê karekî xirab û dij mirovî ye, herweha dijî kurd e jî... U em hêvîdarin ku hîç hêzeke kurd naçarî "peywendîyeke" wisa nehez nebe...

Lê belê, bi daxewe di vî warî da tecrûbên tahl me hene... Dîsa em hêvîdarin ku ew tecrûbên tahl, di dîroka gelê kurd da û di van 10-15 salên dawî da careke dî dubare nebin... Divê hayê kurd li kurd be... Divê kurd, kurdi biparêze... U pêk ve bo parastina mafê kurda hewil bide... Peywendîyên wisa bi qeyd û şert digel her dewlet û hêzekê, em mehkum dikin...

******* Kak Celîl, em hemû kurd gelek ji dil hevkarîya bizava gelê Filistîn dikin... Li her derê û li her dem dijî kiryarên dewleta Israil derdikevin... Lê belê, em dibînin Rêxistina Rizgarîya Filistîn, li hember kiryarên dewletên dagîrkerên Kurdistan bêdeng dimîne, dengê xwe bilind nake... Taybetî di demê qetlîama Helepçe da di serî da Yaser Erefat û serokatîya PLO kiryara dewleta Iraqê mehkum nekir, qet nebe sempatîyek nîşanî gelê kurd neda... Li ser vê yekê bawerîya we çi ye... Di van nêzîkatîya da hûn rastî Yaser Erefat hatin... Hetmen delîveyek peyda bûye ku hûn li ser van pirsa jî digel wan baxivin... Bîr û bawerîya wan çi ye, hem li ser van bûyera hem jî li ser giştî pirsa Kurdistan...***

**GADANI** - Belê... Me wext dît ku li ser van pirsa jî baxivin... Ya rastî, bi giştî li ser pirsa kurda bîr û bawerîya wan min baş dît... Pozitif diramin...
Di her axiftina xwe da behs kirin ku divê gelê kurd rizgar be... Herweha li ser pirsa yêkitîya kurda jî disekinîn... Taybetî li ser pirsa kurdistana Iraqê digel Yaser Erefat axiftim... Me gotê ku divê hûn tesîrekê li ser hukmeta Iraqê bikin, çiku hûn û hukmeta Iraqê dostê hev in... Me jê xwest ku ji bo çareserkirina pirsa kurda li Iraqê bi şêweyekî rast û heq, bixebitin, tesîrê li ser hukmeta Iraqê bikin... Erefat bi xwe qewil da ku digel berpirsîyarên hukmeta Iraqê û taybetî jî digel Seddam bixwe baxive ku çareserîyekê bo vê pirsê bibînin... Herwekî te jî behs kir, bawerîya me kurda li ser pirsa Filistîn gelek baş e û pozitif e... Gelek teda li gelê Filistîn hatîye kirin... Divê ew jî bigihine heq û hiquqê xwe... Rêxistina Rizgarîya Filistîn jî bigihe amanca xwe... Ji xwe dewleta Filistîn hatîye îlan kirin ku ji alîyê 96 dewleta ve hatîye nas kirin... U em dixwazin bizava Filistîn dewleta Filistîn û Rêxistina Rizgarîya Filistîn jî li ser pirsa me kurda hûr be... Çiku em derdê hev baştir dizanin... Helbet divê em jî li gor imkanên xwe hevkarîya wan bikin... Ji xwe çi pêvîstî bûye me kirîye jî... Gelê kurd xwe çu cara ji pirsa Filistîn dûr nekirîye... Piştevanîya rastîn digel wan kirîye... Ji xwe ew jî itirafî vê çendê dikin... Gelek kurd li Libnanê û gelek cihên dî bo gelê Filistîn şehît bûne... Helbet em ne li wê hêvîyê ne ku ew bên bo me şerê çekdarî bikin... Lê belê, ew jî dikarin piştevanîya sîyasî û gelek tiştên dî digel me bikin... Hem li saha cîhanê, hem jî li welatên Ereba da...
........

******* Kak Celîl, em nêzîkî dawîya gotûbêjê bûn... Lê belê, yek du niqte dî jî hene ku bipirsim...
Şerê çekdarî dom dike li dijî Iran û Iraqê... Başe, divê li nav bajêrên Kurdistan, di nav xwendekar, karker, sinetkar, karmend û ronakbîran da jî ji alîyê sîyasî û rêxistinî ve bête kar kirin... Têkoşîn her tenê bi şerê çekdarî, bi gunda û çîya bête teng kirin, îzole kirin helbet baş nîne... Divê têkoşîn li her alî û bi her awayî bête bilind kirin... Lê belê kurdê Iraqê pirtir xwe bi şerê çekdarîya çîya û gunda teng digrin... Xebata sîyasî û rêxistinî di nav bajêran da an nakin an jî bêhêz in... Ev xeletî û heta dikarim bêjim ev xetere ji bo Kurdistana Iranê jî heye an ne?...***

**GADANI** - Divê em qebul bikin ku gelê kurd daîm ehemmîyeteke mezin daye karê çekdarî neku karê sîyasî... Lê belê, îro piranîya hêzên Kurdistanê êdî gihiştine wê bawerîyê ku divê giranîyê, bidine karê sîyasî...
U ev jî helbet di nav xelk da dibe... Heke rojek şerê

»»»»

çekdarî destpêkir daku gelê rêzkirî hevkarîyeke xurt nîşan bide ku serketin bibe...
Me ev tecrûbe heye li şerê sê mehî da... Xelk hat daket meydana û hukmeteke wekî ya Şah nikarî xwe ragire û çû... Di şerê sê mehî da jî xelk li hemû bajêran piştevanîya berxwedana pêşmerga kir ku em di şerê çekdarî da serketin û Xumeynî mecbur bû ku got werin em şer rawestînin... Ev tecrûba me tecrûbeyeke gelek nêzîk û berbiçav e.. Em hêvîdarin ku em û hemû hêzên sîyasî ji van tecrûba kelk werbigrin û ehemmîyeteke mezin bidine karê sîyasî... Heta carna li nav bajêra jî şerê çekdarî bête kirin... U em hêvîdarin ku em hemû di van karan da serbikevin...

***** Kak Celîl, bawerîya we li ser rewşa îro ya rejima Iranê çawan e... Piştî Xumeynî mir, dewrê Rafsancanî destpêkir... Ferqîyek heye... Hilweşîna rejimê nêzîk e an ne...*

**GADANI** - Herwekî me behs kirî, ne şerrawestan, ne mirina Xumeynî tesîreke mezin li ser sîyaseta Komara İslamî nekir... Komara İslamî li ser sîyaseta xwe ya xelet her berdewam e... Xerîke ku ji îzolasyona cîhanî bête der... Zor hewil dide ku ji vê îzolasyonê derkeve... Lê belê ew dijayetîya di navbera wan da hêj delîve nedaye ku bikarin di vî warî da gavan bavêjin... Heke şerê İran û İraqê bi timamî xilas be û ew bigihin aşitîyekê, belkî rewşa wan kêmekê baş bibe û bikarin bimînin... Lê belê, ji bo hukmetekê çareserîya pirsa ekonomîyê gelek grîng e... Ji ber ku wan nikarîye vê pirsê hel bikin, çarekê bo bêkarîyê bibînin, pirsa nerazîbûna xelkê ji alîyê sîyasî ve hel bikin û krîza sîyasî bi giştî çareser bikin, hêvîyek nîne bo wan ku bikarin gelek dirêj li ser hukim bimînin...

Lê belê, hilweşîna wan jî karekî wisa hêsan û sade nîne... Nêzîk jî nîne... Tenê li seranserî İran pêkanîna opozisyneke fireh dikare hilweşîna vê rejimê nêzîk bike û alternatîveke demokratîk amade bike û hukmeteke demokratîk û pluralîst li cihê wan dayne... Ji ber ku opozisyoneke wisa bi qewet li halê nîne, hilweşîna wan jî wisa nêzîk xûya nake... Lê belê, mana wan jî wisa hêsan û dirêj nîne... Heke gel rabe ser pîya çawa hukmeta Şah têk birin, wisa jî dikare hukmeta axûnda (Ayetullaha) hilweşîne... Ji bo vê yekê jî wekî me gotî hevgirtineke fireh li hemû İranê pêvîst e... Helbet divê hîmayeta bizaveke piştevanîya li derveyî welat jî hebe... Ji bo pêkanîna hîmayeta li derveyî welat divê em gelek kar bikin daku mahîyeta vê hukmetê baş bidine nas kirin, ron kirin.... Ku ev hukmete dijî mafê mirovî ye, terorîst e, mirov kuj e.. Bi têkoşîna opozisyona nav welat û bi hevkarîya bizava piştevanîya derveyî welat rejim dê hilweşe û li cihê wê hukmeteke demokratîk û pluralist cih bigre...

***** Kak Celîl, gelek spas bo vê hevpeyvîna dirêj, têrker û bi qîmet... We agahdarîyeke pir fireh û kûr da me... Di dawîyê da û bi rîya rojnama me mesajeke we heye bo gelê Kurdistana bakûr, bo giştî gelê Kurdistan...*

**GADANI** - Ez jî gelek spas dikim ku we ev hevpeyvîne digel min kir û herweha delîvek da min ku bîr û bawerîyên me bi we ra bigihînim... Di dawîyê da, pêşnîyara min ewe ku her kurdekî bi bîr û bawer, pirsa netewî pir grîng û micid bigrin... Taybetî ji ronakbîrên me daxwaz dikim ku vê pirsê bi pirseke bingehîn bigrin... Çi li nav xwe çi li derve hewil bidin ku pirsa me deng vede û bilind bibe... Bi taybetî pêşmergên me, kadir û alîgirên me ku îro di şer da ne, hêvî û daxwaz dikin ku kes û hêzên welatparêz yên kurd hev bigrin...
Li derveyî welat jî xebateke ji dil û bi yêkbûyî bête kirin ku hevkarî û piştevanîyeke xurt bête wergirtin bo xebat û têkoşîna nav welat... Erkê grîng yê wan yek jî ewe ku rejimên dijî gelê kurd teşhîr û ifşa bikin û behsê gelê kurd û Kurdistanê bikin... U herweha bi vê rîyê serinca gelên cîhanê ber bi pirsa kurd ve rabikêşin... Hêvî û daxwazek jî ewe ku hêzên kurd digel hêzên dî yên welatên ku tê da dijîn jî opozisyonekê pêk bînin daku hukmetên demokratîk bînine ser kar... Hêvî û daxwaza serkevtina we û hemû têkoşerên gelê kurd dikim... U herweha hêvîdar im ku rojekê gelê me jî dê wek gelên dinyayê bi serbestî û azadî bijîtin...

***** Gelek spas kak Celîl... Em jî hêvî û daxwaza serkevtina we dikin...*

Çile 1990

**Kendi kaderimizi •••** Baştarafı sayfa 13 de

bağımsızlığı için tek kişi kalıncaya kadar savaşmaya and içmiştir. Dini alet ederek bilinçsiz halkımızı sömürdüğünüz doğrudur... Ama artık halkımız bu silahı kullanmanıza da fırsat vermeyecektir.
Halkımız sizinle müslüman değildir. Ayrıca müslümanlık sizinle kalmayı da gerektirmiyor... Buna da halkımız karar verecektir... Halkımız güzel ülkemizi devletinizin sömürge zincirinden kurtaracaktır ve bağımsızlığını kazanacaktır. "Eşkiyasıyla, teröristiyle, din adamıyla" tüm halkımız bunda hemfikirdir. Hiçbir zaman "ulusal birliğinizin" bir parçası olmadık ve olmayacağız! Bu çabalarınız boşunadır!... Halkımızı daha fazla asimile edemeyeceksiniz. Yüzyıllardır halkımız başınıza yıkılasıca devletinizin tüm yasaklama ve baskılarına rağmen dilini, kültürünü ve geleneğini koruyabilmiş ve korumaya da devam edecektir. Hiçbir güç halkımızı bu mücadeleden alıkoyamayacaktır. Siz şimdi ırkçı ve şoven bir hareket yaratarak tüm dünya türkleriyle ilgilisiniz! Kıbrıs türkleri, Bulgarya türkleri, batı Trakya derken şimdi de Azeri türklerinin, tüm soydaşlarınızın kaderini tayin etmekle meşgulsünüz!
Kürdistan halkı ise ; kendi kaderini kendisi tayin edecektir. Bu konuda sizin gibi hadini bilmezlerin, bilgisizlerin "bilgi kırıntılarına" hiç ihtiyacı yoktur. Halkımız özgür ve mutlu yaşamını kendi gücüyle kazanacağı bağımsız Kürdistan da kuracaktır.

www.arsivakurdi.org

Yurtsever GÜÇ
Sayı 5 * Yıl 2 Mart 1990
Kürdistan Yurtsever Güç Partisi Merkez Komitesi Organı

# 17 Mart 1988 ve Halepçe

**"... Halepçe soykırımı üstünden iki yıl geçti... Ne acı ki, duyarsızlık egemen oldu... Binlerin ölüşü kanıksandı adeta!.. Insanlık adına acı verici bir sonuç..."**

1988 Newroz'u Kürt halkı bakımından oldukça acılı geçti. Irak rejimi, Güney Kürdistan'ın Süleymaniye kentine bağlı Halepçe kasabasına, havadan ve karadan kimyasal bomba yağdırdı... Halkımız güzel mart ayında, ulusal bayramı olan Newroz'a girmek üzereyken 17 mart günü kan ve göz yaşına boğuldu...
İkinci dünya savaşı sonrasında dünya insanlığının yaşadığı en kitlesel ve acımasız katliamıydı Halepçe soykırımı...
Onbine yakın kürt insanı öldürüldü ; bir o kadarı da yaralı ve yüzbinlere varan bir zorunlu göçle Kürdistan'ın Sülaymaniye - Rewandiz havzası "çöl" haline getirildi...
Dünya, bu kitlesel boyutları yüksek soykırıma tepki gösterdi ama kanlı Irak rejimine karşı hiçbir ciddi ve caydırıcı yaptırım uygulamadı! Bu nokta da tepkiler sadece hümanist duyguların "diplomatik" ifadesi oldu!..
Petrodolar "insancıl duygular" karşısında galebe geldi!..
Halepçe soykırımı üstünden iki yıl geçti... Ne acı ki, duyarsızlık egemen oldu... Binlerin ölüşü kanıksandı adeta!.. Insanlık adına acı verici bir sonuç... Ama da gerçek!
Oysa duyarlı kamuoyu her zaman bu türden olaylara karşı etkili oldu...
Her yıl kuzeyden güneye, doğudan batıya tüm insanlık, yüzyılımızın büyük insan kaybı olan Hiroşima kırımını, Yahudi ve Ermeni Soykırımlarını anar durur...
Halepçe soykırımının nitelik olarak geride kalan bir yanı yok... O halde bu suskunluk niye?..
Napolyon "para, para, para" mı demişti... Bu suskunluğu da "çıkarlar, çıkarlar, çıkarlar" şeklinde izah etmek kesinlikle güç değil! Baksanıza Irak'ın her kamptan "müttefiki" sekiz yıl savaşı sonrasında Irak'ın "imarı" projesinden pay alma yarışında tepişip duruyorlar. Bu koşullarda Irak rejimi hiç "azarlanır mı"?!.. Irak rejimi işte bu rahatlık içinde bu kez de Kürdistan bölgesini, "sınır" boylarından başlayarak çoğunluk kürt nüfustan "arındırmaya" başladı ve bu doğrultuda hayli de mesafe aldı... Tepkiler yine kapalı kapılar ardında ve duvarları yalıyor, hepsi o kadar!..
Irak rejimi bu kez de kalkıyor, sürgüne gönderdiği kürtleri tel örgüler içine tıkarak "kamp-kent"lar oluşturuyor... Bunlardan biri de Süleymaniye altlarında "kurulmuş"!.. Adı da büyük bir pişkinlikle "Yeni Halepçe" olarak konmuş!.. Bu "girişim" 1988 Halepçe soykırımı üstüne, yeniden halkımıza karşı yapılan en küstahça saldırıdır...
Acının bir diğer yanı da rejimin bu pervasızlığının dizginlenememesidir...
Şurası açık ki ; halkımıza karşı işlenen soykırımlar, dayatılan toplu sürgünler gibi suçların müeyyidesi ancak halkımız tarafından verilebilir. Uluslararası kamuoynun harekete geçirilmesi de buna bağlıdır... O nedenle Halepçe soykırımına karşı etkinlik adımı öncelikle kürt halk hareketiyle başlar...

Uluslararası kamuoyunu aktifleştirecek temel kaldıraç ancak bu ulusal güç olabilir... Ermeniler, kendilerine uygulanan kitlesel soykırımın yıldönümlerinde tüm dünyayı ayağa kaldırabiliyorlar... Kürt halkının güç ve olanakları aynı olmasa da, Halepçe soykırımının yıldönümleri büyük bir ulusal konsensüs içinde organize edilmeli ve dünya insanlığının dikkati sürekli soruna çekilerek olay diri tutulmalıdır. Ermeniler için "24 Nisan" ne anlama geliyorsa, bizim için de "17 Mart" o boyutta, kürt halkına karşı işlenmiş insanlık suçunun çaplı protesto günü olmalıdır... Tüm yurtta ve yurt dışındaki kürtlerin 17 Mart günü içinde bulundukları olanak ve koşullara göre yankı uyandırıcı etkinlikler geliştirmeleri, yaygınlaştırmaları soykırımda yitirilenlere karşı saygının gereğidir ve daha ötesi ulusal kurtuluş savaşımının yükseltilmesi bakımında da önemli bir atılım olacaktır... Halepçeyi anmak bu şekilde olabilir. Halepçe soykırımı yıldönümleri, ulusal ve uluslararası çapta halkımızın dörtbiryanda haykırdığı, etkinlikler gösterdiği, savaşımın yükseltildiği günler olmalıdır...

Soykırımda yitirdiğimiz binlerce insanımızı saygı ve savaşım andıyla anıyoruz... Soykırımı yapan düşmanı lanetliyoruz!..
Halepçe unutulmamalıdır... Kürt ulusu ; Halepçe'yi unutma!